

GOVEND

Kovara Çandi û Huneri / Kültürel ve Sanatsal Dergi

Yıl: 1 Sayı: 3 Nisan - Mayıs 1992 (İki Ayda Bir Yayınlanır) Fiyatı: 5000 TL. (KDV Dahil)



- ✓ NAVEROKA NEWROZÊ...
- ✓ KOMARA MEHABAD...
- ✓ LI SER ROJIJMÊRA KURDÎ...
- ✓ JI NAV KLASİKAN: "EHMEDÊ XANÎ Û İLYA EHRENBURG"...

GOVEND

Kovara Çandi û Huneri / Kùltürel ve Sanatsal Dergi

SAHİBİ

Mazhar KARA

SORUMLU YAZI İŞLERİ MÜDÜRÜ

Mükerrem AYYILDIZ

YÖNETİM VE YAZIŞMA ADRESİ

İnönü Cad. Kahraman İşhanı
Kat:2 No:13
DİYARBAKIR
TLF/ FAX:136 63

BANKA HESAP NO:

Mazhar KARA Adına
T.C. Ziraat Bankası D.Bakır
Merkez Şubesi
353764 Nolu cari Hesap

ABONE KOŞULLARI

6 AYLIK : 15.000
1 YILLIK : 30.000

İLAN TARİFESİ

Arka Kapak : 750.000
İç Kapak : 500.000
Tam Sayfa : 300.000
Yarım Sayfa : 150.00
1/4 Sayfa : 75.000

DİZGİ

EZGİ PRODÜKSİYON

BASKI

BARAN OFSET

İÇİNDEKİLER

Pêşgotin.....	1
Naveroka Newrozê	
ROHAT.....	2-5
Çend Çarin	
BARAN	6
Lı Ser Rojijmera Kurdi	
B. SORAN	7-10
Helbest (Bı Evinê Avdan Toven Vi Axê)	
M. KARA	11
Dı Dıroka Gelê Kurd Da Rojêke Bı Qedr û Qimet	
SÎRVAN (Kurdıstana İnan)	12-14
Jı Zargotına Me	
B. ZINAR	15
.Gotmên Pêşıyan	
BENGIN	16
Jı Nav Edebiyata Cihanê	
F. ŞEXANI	17
Mele Yunus Kaya Jiyana Xwe Qedand	
L. ÖZDEMİR	18-19
Jı Nav Edebiyata Kurdi ya Klasiki	
A. NÜBAR	20-21
Serbori (İşev Bavê We Nayê)	
HESEN	22-23
Heykeltraş G. ATEŞİle Röpörtaj	
DILOVAN	24-25
Helbest/ Şiir	
Laleş QASO / A. ADSIZ	26
Jı Nav Weşanên Nû	27
Helbest	
EZMAN / M. EKMEK	28
Jı Bo Zarokan	29
Jı Nav Folklorê Gelê Me	
SİPAN	30
Xaçerêz / Pêkeni	31
Jı Xwendevanan	32-33

PÊŞGOTIN

Xwendevanên delal,

Em di hejmara xwe ya sîsiyan de carî dîn bî hev ra ne.

Dî Welat da, me Newrozek bî xwin û dijwar derbas kîr. Brîna gelê me kûrtîr bû. Ev cejna jî bî xweşiyê derbas ne bû. Qolonyalistên hov bî çek û topên xwe êrişê gelê me yê destvala kîr. Bî sedan mîrov kuştî. Lê gelê Kurd stûyê xwe xwar nekîr û bî her awayî xwestî û armancên xwe yê azadiyê bilînd kîr. Lî seranserê Kurdîstanê cejna xwe pîroz kîr. Gelê Kurd dî rojên nêzik de wê cejnên xwe dî axekî azad de pîroz ke. Ev bawerîya me pîr kûr û mezî e.

Dî xebata huner û çanda gelê me yê pêşverû da, em jî gor roja destpêkê gelek xûrtî û bî bawerî. Eşkereye ku dî vê pêşteçûyîne de alîkarî û piştgîriya we ciheki gîring dîgre. Jî vîr pêve jî em hêvidarî ku ev alîkarîya we wê dom bîke.

Dî vê hejmarê de me gaveki nûh avêt û me bîryar gîrt ku, her bîçe em zmanê xwe yê zîkmakî bî kar binî. Jî ber vê yekê, me vê Pêşgotîna xwe jî bî Kurdi (Zaravê Kurmancî) nivîsand. Jî anwa ve, divê hûn kêmasiyên me bîbexşînin û bî rexneyên xwe yê dostanî vana nişanê me bîdî.

Wek hûn dibînin, ev hejmar hînek dereng ket. Ev astengi ne jî destê me pêkhat, jî ber ku rêzkîrvanê (Dizgîcî) me Nevin ÎL hat gîrtî... Sûcê wî gelek mezî bû(!). Lewra ew dî şeva Newrozê de beşdar bû, ku lî 14ê Adarê lî Diyarbekîrê hat sazîrî. Ew hî jî dî gîrtîgeha Diyarbekîrê ye.

Dî hejmarên pêşî de, em tev bî hev ra Govende kî bî naverok û xûrtîr bîafirînin. Tîşte ku jî bo gelê me pêwîste jî ev e.

Bî slavê xwe yê germî û bîratî.

GOVEND

NAVEROKA NEWROZÊ

Bı Çaveki Mitolojik Folklorik û Politik

Newroz Rojêke Nuye

Newroz, di nav gelê me da bûye nişana dax-waza berxwedanê. Peyva Newrozê ji du gotina pêkhatiye, nû û roj. Dı nav gelek sêlen da nûroj, nûroz û newroz, bı vi têhri hatiye guherandin. Cejna Newrozê cara pêşin di nav Kurdan da hatiye pirozkırın, paşê ev cejna di nav gelên afgan, belucin, farsî, tacik, oset, tat û talış hat naskırın, di nav van gelên cınar da, cejna Newrozê angori bı naverok û motívên netewi va hat xemilandın, dewlemend bû. Ji ber nêzikbûna kontakên çand û zman di nav gelên İranê da, ji aliyê dın sal bı sal di navbera van gelan da peywendî û pevgırêdanên cuda hatın pêkanın. Hemû van yekana, li vé hêlé belavbûna cejna Newrozê hêsatır kir.

Dı nav kurdan da rojen şabûnê wek cejn, eyd, mehrıcan û şahî tên zanın. Dı nav van rojên nav û nişan da bé şık, cejna here kevn cejna Newrozê ye. Ev cejna beri bûyına İsa pêxember, di dew ra dewletên Kusi û Med da peyda bûye (sala 612) û serpêhatike wê dúr û dirêj heye. Bı vi têhri mirov dikare bêje, ev cejna iro dikeve 2604 saliya xwe.

Çawa di serpêhatiya Newrozê, di mitolojiya wê da kıvş dibe, weki di salên agir û hesin hat ditnê, ev cejna wusan ji dema di nav mirovan da peywendiyên koletiyê xurt bûn, peyda bûye.

Pirozkırına cejna Newrozê, navbera hatına rojên baharê, rojên germ û dúrketına rojên zıvıstanê, rojên sar da té pirozkırın. Ji aliyê dın Newroz wusan ji di nav gel da té zanın wek "Cejna Serê Salê". Dı van rojan da, çawa té zanın jıyın gul vedide, dikele. Bı ditına me, ev cejna berxwedanê, pirozkırına wê di nav van rojan da bı tesadufi nine, navdanına wê ya cejna

ROHAT

serêsalê ji tesadufi nine. Hilbijartına van rojan, efrandariya gel nişani me dide. Meha (Axlêve, Avdar, Newroz), di vé mehê da jıyın çalîkê xwe diguherine, dorber hêşın dibın, hêbunên tebiyetê jındar û hişyar dibın. Dı vé mehê da hulmgulma kela baharê di nav gel da şabûnekê peyda dike. Ev şabûna dıghêje dereceke here bılınd. Ji ber vé yekê, gel ev meha, despêka serê salê hilbijartiye û lêxwedî derketiye, xıstiye malê xwe. Gelê me xwestiye, pivaye, her tışt daye ber çawê xwe, hıldaye-daniye û tıştên baştır hılçandiye. Bı xwe ev karê gel, di nav efrandinên folklorê da gelek berbiçave, gel timê aliyê tıştê baş girtiye, ev xeysetê efrandariya gele.

Bı xwe di nav peyva mitolojiyê da du tıştên giring hene, armanc û çerçevêk heye. Ev peyva

ji du peyvan pêkhatiye; "mit" û "logos" Mitoloji bı serê xwe tenê çirok, mit û efsane nine, xem û xeyal nine. Ji aliyê dın di nav vé peyvê da kerik mantik (zanebûn, logos) ji heye. Ji ber vé yekê peywendiyên felsefi di nav mitolojiya Newrozê da pır xurtın.

Dı Nav Klasi-kan Da.

Heta niha li ser naveroka cejna Newrozê bı çaveki mitoloji, folklorik û politik pır tışt hatine nivisandin. Bı taybeti di nav hın efrandinên klasik da pır tıştên hêja hene. Hêdi-hêdi gelê me li ser cejna Newrozê zanebûna xwe hın fireh kir û naveroka wê dewlemend kir.

Pirtûka olperestiyê Zend-Avesta çawa té zanın, di nav gelên İranê, wusan ji di nav kurdan da, pirtûkeke pır kevnê. Dı nav vé pirtûkê da li ser cejneke baharê hın tıştan cih girtine, bı ditına me ev cejna Newrozêye. Ji ber ku êzidiyên ku iro di şopa vé pirtûkê da dimeşın, di nav wan da



cejneke wek Newrozê bi navê "Cemayi" hin ji hebûna xwe iro diparêze.

Cejna Newrozê bi tehreki fireh cara pêşin di nav efrandina Firdefsi, "Şehname" da cih girtiye. Gelê kurd, çawa derketiye madarê ev pîrsa ji cara pêşin di vê efrandinê da hatiye nitrandin. Ev efrandina hêja paşi bûyina İsa, di sala 999' an da hatiye nivisandin, efrandin gelek firehe. Di despêkê da li ser mitolojiya Newrozê hatiye seknandin, Firdefsi yek-yek mîrxasên serpêhatiya Newrozê bi me dide naskirin.

Efrandineke mayin ji, "Newrozname" Omer Hayame, di vê efrandinê da ji nexş-nigarên cuda li ser vê cejna gelên İranê heye.

Çawa tê zanin di sala 1597'an da mirê kurdan Şerefxanê Bitlisi, bi navê "Şerefname" efrandineke hêja li ser diroka kurd û osmaniyan nivisi, di despêka vê efrandinê da li ser Newrozê û hovitiya zalimê Dehaq hatiye seknandin.

Pîspor û helbestvanê kurd Ehmedê Xani di destana "Mem û Zîn" da kurd çawa Newrozê pîroz dikin, bi hatina baharê va mirov çawa ji qalkê xwe derdikevin, çawa şa dibin, bi zîmanekî xweş û zelal va nivisiye. Ev efrandina di sala 1665'an da hatiye nivisandin, keriki wê da Newroz, bi vi tehri nitrandin:

Jî Bextê şin vedigere bahar

Nişan dide Newrozê

Di rêça vê kevneşopiyê da

Bajarvan û gundi hemû bi hevra

Tenkandin birc û malên xwe

Wek nêçirvan û cerdê

Hêdi-hêdi berbi serê kelan û beriyana meşiyana

Bi beş-beş derketin bîndarûk û seyranê

Hemû rengê mirovan, piçûk-mezin

Hemû çûn, nema tu evdê xwedê li bajarana

Ji wana hinek bi peya çûne bax û baxçana

Hinek bi siyari berbi qontirên çiya henkin

Hinek bi zar û zêçana va

Hinek bi hevalan, hinek ji bi tenê meşiyana

Rabûn zeri-doman û jin ji

Ew ji wek gulana, di nav baxçana

(Ev helbestê Ehmedê Xani angori Kurdiya iro hatiye zelalkirin)

Xên ji van efrandinên li jor nivisandi, di gelek efrandinên farsî û kurdi da ji tiştên hêja li ser cejna Newrozê hene.

BI ÇAVEKI MITOLOJIK

Iro li ser mitolojiya Newrozê li hin hêlên cûda, gelek serpêhatiyên cihê tîn dengkirin. Ji

bo pêştabirina folklorê xwe, gel ji ber xwe gelek tişt efrandiyê û tevi naveroka Newrozê kiriyê, ew dewlemend û rengin kiriyê.

Gelên vê navçê dixwazîn ji destê zordestê Dehaq (Ejderhaq, Zehaq) xelas bin, azad bin, serpêhatiya Newrozê diçe dighêje van rojan. Bi zîmanê pehlevi navê Dehaq "Biyarbs" derbaz dibe. Hin çavkani dibêjin ku Dehaq bi xwe Erebe. Bi baweriya me tiştê girîng, ewe ku Dehaq kesekî xwinxware, zalime. Gel dixwaze pêsira xwe ji vi kesi xelas bike, bona vê ji gel hertim li diji wi ye. Bi vi tehri gel naxwaze stûyê xwe ber zordestiyê xar bike, gel şer dîke, pêşengiyê Kaweyê mîrxas dimeşîne, gel û Kaweyê mîrxas dibin efrandarên Newrozê.

Angori mitolojiyê rojekê ji rojan di nav gel da nereheti û bêhizûrike mezin peyda dibe. Di wê demê da, Dehaq lêdixê bedena mirê wê dewrê, Cimşit dîke du keriyana, wi dîkuje, xwe ji li ser text rûdinê, disa angori mitolojiyê textê wi li dora 1000 salî ajotiyê. Dehaq bavê xwe ji dîkuje, di Şehnamê da ev yekê bi vi tehri hatiye nitrandin. "Lawekî nebaş weki bibe şêreki hov ji, disa nikare mîraniyê bike bavê xwe bîkuje xûna wi birêjîne".

Êrişî û hovitiya Dehaq dema, di her namilên wi da serê du marên reş derdikeve, destpêdîke. Ev nexwaşiya xeder, wi hin ji har û din dîke. Ji bo dîtina dermanekî ji bo vê nexwaşiya xwe, ew bangî hemû hakimî ji dixtorên welêt dîke û alikariyê ji wan dixwaze. Rojekê angori mitolojiyê şeytanek nêzîki wi dibe, dizîkava guhê wi da dibêje: "Tu tenê mêjûyên kesên ciwan bide van maran, tişteki din mîde wan ji bo xarîné. Dibe, ev marana van mêjûyan bixwin û dawiyê da ji bîmrîn, tu ji xelas bîbi. Ji ber vê yekê pêwîste tu herroj du kesên ciwan bîkûji, ji bo mêjûyan derxi, pêwîste tu serên wan jê bîki". Ew peyvên şîretên şeytin, destûrê dibe parêzkarên xwe, weki herroj du kesan bukujin û mêjûyên wan bîdin maran. Bi vi tehri herroj du kesên ciwan hêrs û nîka gel li diji Dehaq bilind dîke. Dilê herkesî bi kuştina van kesan dişewite, di nav van da du xulamên Dehaq ji hene. Yek ji vana Ermayil kesekî dîndare, Kermayil ji kesekî pêşverûyê, pêşiya xwe dibîne. Ev herdu xulamên wi tinin herroj mêjûyê mikê tevi mêjûyê din dikin, didine Dehaq. Bi vi tehri her meh 30 kes azad dibe, ew direvin diçine serê çiyana û hejmara wan dighêje 200 kesî. Bi vi tehri, angori Şehnameyê ew kesên ku direvin li serê çiyana û azad dibin, kakilê peyda bûyina gelê

kurd pêkanine.

Ev tîştên li jor goti, tenê beşeke serpêhatiya mitolojiya Newrozêye. Newroz paşe despêdike dibe cejnêkê. Dî vê beşê da keseki xebatkar-Kawe ji nav gel derdikeve, pêşengiya gel dike û vê hêrs, nka gel ra rêkê dibine. Ev bûyera ji di nav cejna Newrozê da beşeke duwemine.

Dî vê demê da çawa em dibinin, keseki bi navê Feridun, wek mîrxaseki di riya Kawe da dimeşe, ew ji, ji nav gel derdikeve. Ew di nav wê tekoşina li diji Dehaq bilind dibe, bi aktîfî têda çih digre. Angori mitolojiyê rojekê diya wi, jê ra dibêje: "Tu zani çî hate serê bavê te Abdin?". Paşê Feridun tê dighê weki bavê wi ji aliyê Dehaq da hatiye kuştin û mêjûyê wi ji daye maran. Hêrsa Feridun bilind dibe û baweriya tohîdanê lê peyda dibe.

Pey van hemû zordestiyan, gel berbî qesra Dehaq dimeşe. Nav gelda dengên "Em wekhevîyê dixwazin, dadimendiyê dixwazin" her diçin bilind dibin, ew li pêşiya gel van durîşman ducar dike, KAWÊ bi xwe ye. Êdi pêşengiya serhîdanê dikeve destê zehmetkêşeki, karkereki, KAWÊ, ew, hêjabûn û xemla Newrozê.

Paşî vê serhîdanê Dehaq tê kuştin, ji ortê radibe. Gel ji şabûnê êdi nikare hêsrên çavên xwe bigre, roj, roja serketinêye. Roja pirozkirina Newrozê, ji ev roja serketinêye. Hin çavkaniyên li ser mitolojiya Newrozê ji bo rolên Feridun û Kawe tîştine çihê dîvîsin. Hin çavkani dibêjin ku Feridun destûr derxistiyê weki li Çarsuya hesinkaran da gurzên baştir bîn çêkîrin. Bi van gurzên va dema gel dajo ser qesra Dehaq, hin kesên dibêjin pêşajo Feridunê, hin kes dibêjin pêşajo Kawe bûye. Şehnamê da çih digre, weki Dehaq bi destê Feridun tê kuştin, Feridun tîne mîxeki li serê wi da dikute, wi dikuje, kesê ku gel berevkiriyê, ew rakiriyê ser piya û xwe ji daye pêşiyê, Kawaye. Ew, di nav mîrxasên serpêhatiya Newrozê da çihê pêşin digre. Bi xwe ji armanca Feridun û Kawe di piratikê da yeke, navbera wan xweşe, piştî hev digrin.

Ji aliyê din, ji despêke heta dawiyê Feridun di efrandina Şehname hertim li ber şaxsiyeta Kawe temene dibe. Vê yekê, di beşeke Şehnamê da bi vi tîhri çih girtiye:

"..... Paşê, ji kelê, alên bi qumaşên kesk, sor, zer belav bûn û navê wê danin "Ala Kawe" ji vê demê heta, li rûnişte ser wi texti, ev nav girt. Li ser vi çermê hesinkar, tîştên giranbiha hatin dardakînin. Awa, bi van qumaşên giranbiha va ala

wi kete tîhriki din. Dî nav şeveke tari da wek rojekê hilat, dilê dinyayê bi van hêviyan va tîji bû".

Dema text ji destê Dehaq hate girtinê, êdi da-wiya kul, derd û zordestiya hate birinê. Êdi pêwîst bû cejnêk bihata pirozkirin. Ew rojên reş êdi dîr ketibûn, paşê pirozkirina Newrozê wek cejnêkê bû edet.

BI ÇAVEKI FOLKLORİK

Cejnên gel, li ser derd, kul, şin û şahiyên gel bilind dibin. Van cejnên tenê gel dikare bi efrine û wan bîparêze. Ew cejnên ku bi piraniya daxwaz, xwestin û hêviyên gel va bi hev neyên -cejnên resmî, dini- ji aliyê gel da nayên pejirandin.

Newroz, bi derd-kulan, şabûn û hêsrên çawan va hatiye avdanê û meya xwe girtiye, ji ber vê yekê vê cejnê di dilê gelê me da çheki germ girtiye.

Bayisê belavbûna vê cejnê di nav gel da bi taybeti karkertiya Kawe, zehmetkêşiya wiye, bona vê yekê ev cejna hat gihişte van rojên iroyin.

Çawa tê zanin, di wê navçê da dinê islam pîr xurt bû, cejnên dini di van cîvatên vê hêlê da tesîreke mezin hiştine, disa ji van cejnên çihê Newrozê tîji nekîrine, gelê me hertim naveroka wê ya pêşverû parastiyê heta van rojan ji ew xweyikiriyê.

Ji bo beravkirina gel, Kawe mêzara xwe wek nişanekê ba kiriyê, ev mêzara hesinkariyê (Dîrewşê Kawe) gel ev yeka bijartiyê wek alekê ji xwe ra, paşê ev ala di nav rengên kesk-sor û zer da xemilî. Iro ev rengana bûne nişaneke netewî ji bo gel.

Çend çavkani çawa diyar dikin, weki ev heyhîldana Kawe û Feridun li diji Dehaq, di nav kurdan da paşê bûye bawerike mezin, di nav kurdan da wek "Şênahiya Tolhîdanê" belav bûye.

Iro çawa em dibinin li ser Newrozê di edebiyata kurdi da stilek bi kar tê anin, hemû hêzên zordest bi navê Dehaq (Dehaqên Nû) tîne navkirin, bilindbûna şerê gelê me li diji Dehaqane, pêşengiyê Kawe dike. Ev yeka tîşteki nûye, gelê me tevi naveroka Newrozê kiriyê.

Li Kurdistanê dema rojên Newrozê nêzik dibin, kûrên agirê (ar, adir) mezin tîne daninê, gelê me êgir vêdixê. Ditina êgir di nav gelên Iranê da bûyereke mezine. Bi navê-Huşeng-mîrxaseki gel, rojekê ji bo mareki bikuje kevîreki davêjê, ew kevîr diçe kevîreki din dikeve,

çırûşk jê derdikevîn, ev bûyera dibe bayisê nasîna agir dî nav gelên vê navçê. Iro bingehên pirozkîrîna cejna "Sede" li Iranê dirêjî van rojan dibe. Kawe bî xwe hesinkerek bû, hesîn dikuta, ji bo hesîn nerm be, kêrî tîşteki bê, ev pîr hewce-dari êgir bû. Paşê ev agir ji bo pirozkîrîna Newrozê bu nişanekê. Tê gotin ku, Kawe ji bo gel berev bike li serê kelan agir vêxistiye û bûye nişana hawarê. Disa dî pirtûka "Zend- Avesta" li ser hêjabûna êgir gelek tîştan cih girtiye. Dawiya rojên zivistanê rojên sar û destpêka rojên germ, rojên baharê da "Germbûn" bûye mîzgîna rojên xweş, vê yekê rûmeta êgir bilindkiriye. Evyeka dî metelokeke kurdî baş cih digre "Kê gotiye agir cehenemeye, ew bî xwe cehenemeye." Dî rojên zivistanê, dî nav kurdan da edeteki kevne, weki li dor kuçk rûnên, bî êgir va bilizin. Dî dinê kurda yê kevî "Zerdûş" da agir pîr tîşteki hêjaye ev yeka bî dinê îslam va hev nayê, ji ber ku agir dî dinê îslam da nişana cehenemeye

Iro ev çırûskên belav dibin, bûne nişana bilindbûna şer li welatê me, kareki esmaniye (abstrak). Li Kurdîstanê li her cihê vêxistina êgir, jindariya daxwaziya azadiya gel baş nişane me dide. Ew çırûsk, bî vê daxwaze va tev li hev dibin, dibin yek. Dî efrandinên folklorê da ev hevanin-hevçûyînan pîr xurte, ev yeka ji tujbûna pîvandin û ditinên gel nişani me dide.

Bî vi tehri ji bo hebûn û parastina cejna Newrozê gelê me, gelek tîştên madi û manevî efrandiye.

BI ÇAVEKI POLITIK

Li kurdîstanê tekoşîna gelê me li dîji hêzên kolonyalist, bî taybetî dî despêka Sedsaliya 20'an da pêl da, pêşta çû. Pey vê yekê van hêzên kolonyalist ji bo ortêrakîrîna hemû hebûnên gelê me, ji bo faşîrîn û jarkîrîna wan, çî destê wan hat, anin cih wusan ji, tu wext destûr nedan weki gelê me bî xweşî vê cejna xwe piroz bike. Cejna Newrozê cara pêşîn tenê dî sala 1946'an, li Komara Mahabatê da bî serbestî hatiye pirozkîrîn. Paşê li Kurdîstana Iraqê, dî şoreşa burjuva-demokrat, dî sala 1958'an hat pirozkîrîn. Ji ber van hemû dijiwariyan, disa ji gelê me, dî nav xwe da, bî xweşî Newroz pirozkîrîye û bî giyanê rizgariya netewî va xemilandiye.

Bî vi tehri girîngiya pirozkîrîna cejna Newrozê, dî warê politik da zêde bû, naveroka wê dewlemend bû. Bî taybetî nivîskarên nîşîfa nûh, dî efrandinên xwe da cihêki fireh dane Newrozê. Wan bî çaveki tekoşîna rizgariya netewî va, na-

veroka wê ya şoreşgerî nihêrine. Dî efrandinên şanoyan da (tiyatroy) ev yeka gelek berbiçave. Nivîskarê kurd Cemal Abdulkadir Baban bî helbestvani, efrandîneke bî navê "Newroz" nivîsi. Dî vê efrandinê da serpêhatîke keçêke kurd Gûlîzer hêye. Ev keçka dikeve destê Dehaq û zordestiyên mezin têne serê wê, naveroka vê şanoyê pêk aniye. Nivîskarê Kurd Kemal Burkay ji, dî "Dawîya Dehaq" da li ser camêriya Kawe û dî bin vê camêriyê da ji tekoşîna gelê me dî vê rewşa iroyin da nişan dide. Disa Zeki Ahmet Xanari ji "Xelasbûna Rojên, Dehaqê Zordar" bî vî navi va şanoke dîni nivîsi. Hemû ev efrandinan dî nav çanda kurdî da tesîra cejna Newrozê dî warê azadiya gelê me da, nişani me dide.

Despêka rojên baharê da, dî nav gelê me da pirozkîrîna cejna Newrozê ji bo rojên xweş, daxwaz û hêviyên gelê me diyar dike. Gelekî naxwaze wunda bibê û gelekî rojên xweş hemêz dike, bî baweriya me tu hêz nikare li pêşîya vê meşê bigre. Hêzên zordest bivê-nevê wê binkevîn. Dirok li ser milên gelên cihanê diherike, ew pêştaçûyîna civaki tayin dikin. Hemû zincîrên ku pirozkîrîna Newrozê qedexe dikin, rojekê ji rojan wê bişkên. Ev baweriya me, wek hêviya dî helbestê Paplo Neruda da, helbestê bî navê "Strana Genim" wusan jindar û xurte:

Gelê min, ez bî tiliyan va nayêmin jimartin

Dî dengê min da hêzek dibîncê

Dî tariyê da bejn dide

Bêdengiyê diqelêşe

Mîrî, mîrxas, si û bûz, çî hebe

Wek tov dikeve axê

Û gel dî erdê da çal bûye

Tov li cihêki maye

Genim çawa bejn dide

Derdikeve li ser rûyê erdê

Bî destên bedew û sor va

Diqelêşe û gul dike bêdengiyê

Em gelin, carke dî dizên ji nav mîriyan.

Cejna Newrozê, bî rengêki "Cejna Bahar û Azadiyê", dî nav tevgera pêşketîna gelê me da wê roleke hin ji mezin bilize. Cejna Newrozê kerîki çanda cihanêye, pirozkîrîna Newrozê û roja dîji nijadperestiyê, çawa tê zanin 21 Adarê da berhev ketine, vê yekê kemala Newrozê hin ji zêde kirîye. Rojekê, dî şevêşa berbangê da gelê me, wê stranên serketîne va derkevîn kuça-kolanan tîji bîkîn, ev şabûna rizgariya gelê me, wê cejna Newrozê hin ji bîxemilîne.



18-9-1984
KRONOSELG FOLK H.S.

ÇEND ÇARIN

BARAN

Çemê deştê za bû li bin tava havinê
Çemê bin erdê bê deng çû giha Ummanê
Bî halana nav û dengêki seravê xwe mexapin
Kûr biçê, navê xwe li kevîr û hesin binexşîne

Yeki kor çawa dikare li hev bine rengan
Yeki kehr çawa dizane qedr û qimeta dangan
Hosteki bbin ji xwe ra, hunerê hin be
Beri ku li vi baxçeyi bibi baxçevan

Te cot kir li çiyeki şoran û bi din
Zadê bejn ne da û bê ber ma fêkiyin
Hêviya xwe wînda meke, Cotkaro!
Erdê tevde paqîşke, biguhurin.

Bî lédana çakûç hezaran cik dirêşin
Hedad şevê dihelinin, roje dirêşin
Hedadi ne gora bihtengan e hevalo!
Beri xwe polake, hin dest bavêje hesin

Ger dilê te geşbe ev dinya wek gulistan e
Bî birin be, pin û pag e, wek goristan e
Min jê hezkir tim, çî di cejnan, çî di şeran da
Dinya xweş e, delal e, lê ne wek Kurdistan e

Berfa teze ji min ra xem û xeyal anin
Ji zarotiya min çirok û xezal anin
Jiyan tevneke rengin e, her çêkir
Û bi dû xwe ev pênci sal anin

Zaroti bî çavên zelal wek kaniyan e
Ciwani bî kar û evin wek pîlîngan e
Çî heşyden sali bi, çî heştê sali
Jiyan wek sévek sor e, dil ciwan e

ÇEND GOTIN LI SER ROJÏMÊRA (SALNAME) KURDÏ

B. SORAN

Dı diroka netewayên cihanê da destpêka jiyana komelayeti û sererast bûna deman bî terhêki nasyari hatiye nişanekirin. Her netewek buye xwedi dirok, her wiha rojîmêr. Her tê zanin ku, netewên Ewropayî dı destpêkêda Salnameyên (KALENDER, TAKVİM, ROJÏMER) xwe, jı hev girtine. Dı xwedibûna rojîmêran de ol (din) ciyeki giring girtiye. Lı ser ruyê cihanê dıkarın bêjin ku, hemû rojîmerên netawa lı gora bawerayeti û oldari hatiye pêkanin. Berevac dıkarın bêjin ku, yekem netewe cihanê Kurdın ku, rojîmera wan, ne oliye. Ango tene milletê kurde ku rojîmera xwe netewi (milli) ye. Lewra ger em lı ser lêkolina diroka rojîmera gelan qaseki mijûl bın, emê baş bının ku ewana hemû yan HIV yan ROJ yan jı zayına miroveki jı xwe re kirne destpêka demê. Jiber vê yeke ye ku dibejın, hicri, şemsi, rumi yan jı miladi. Diyare iro lı gelek ciyê cihanê êdi hemû millet xwe bı gora Rojîmêra ku zayına İsa nişandide, anga Miladi, naskırine û pêrevê we rojîmêrê ne.

Kurda dı diroka xwe da du rojîmêra nişan dane. Yek jı wan dı sala 670 ya beri bûyına İsa(Bİ:670) dema ku bajarê Ninowa hatiye sitandin, ya dın jı, bı du sal şûnda disan beri Buyına İsa (Bİ: 668) sala 668 dema ku Serdariya Medya damezraye. Ev her du bû-

yer, bûne destpêka rojîmera kurdan. Diyare ev her du bûyer jı, Netewi, anga milli ne. Dı halek da ku milletê kurd milletek bındest û dagirkiri ye her wiha tu cari heyin û rengên netewayetiya kurd ne hatiye bı karanin, disan jı, roj û şev û meh (hiv) û salên kurd, nav û xasyetên xwe parastine.

Dı rojîmêra kurdi da destpêka demên salê jı Zıvistanê digre û bı rêz Bıhar, Havin, Payiz lı du hev tên. Lê Tırk dema ku her çar beşên salê têne jı martin, rêza wan wihaye: Sonbahar(payiz), Kış (zıvistan), İlkbahar (bıhar), Yaz (havin). Her wiha Tırk Bıharê dıkin du beş û jı beşeki ra dibejın 'Bıhara E-wıl' û jı beşê dın ra jı dibejın 'Bıhara Paş'. Ev her du navên bıhare disan jı mane xwe hene. Her çend ev mane ne bı zımanê tırki

jıbin, lewra 'BIHAR' peyvek kurdi ye ku jı daçek û regek pêk hatiye û bûye Peyvek hevırti. 'Har' dı zmanê me da bı maneya tor têr xwinkel e ku Tırk jı vê peyvê ra dibejın: Azgın. Bı+Har tıştê ku her û daim har e. Ango ew dema salêye ku hawir dıkele û dı qıjqıje. Gelo dı zmanê Tırkan de mana 'KIŞ' û 'YAZ' çıye? Bê guman ev herdu nav jı yan malên diziyê ne, yan jı bê mane ne.

Dı rojîmêra kurdi da navên deman û hivan û rojan her yek maneyek xwe heyê û dema tê zman gazi bûyerek dıke. Destpêka rojên kurdi Şemi ye. Ev

S A L N A M E



ÇEJNA NETEWÏ Û SERSALA GELE KURD

NEWROZ PİROZ BE

Ev salname di çiyêna rojîmêrê de bı bêr mayê. Lê jı bo zanên û hêvîkerên xwe giring ye dıroka gela Kurd e.
Ankara Bıharan Tırkî Ewropayî Apt. B Blok No: 146 K.T.O.26
Tel: 512 21 56 34 Fax: 512 47 26 Akademya - STANBUL

DENG

rêz wihaye: Şemi, Yekşem, Duşem, Sêşem, Çarşem, Pêncşem (D1 bikaraninê da tipa 'c' ketiye) û In e. Tirk, di navbiriya heftroja xwe da ji roja Duşemê destpêdikin. Pazartesi (Duşem), Salî (Sêşem), Çarşamba (Çarşem), Perşembe (Pêncşem), navê van her du roja ji her ji kurdi hatiye dîzin- Cuma (In), Cumartesi (Şemi), Pazar (Yekşem). Diyar e ku rêzkirina Heftroja kurdan û ya Tirkan ji ji hev gelek cûda ye. Ev cûdayi di rêzbûna sirojani da ji, angoyi di mehan de ji disa xwe dide nişan.

Navên meha di nav kurdan da bi gora hinbûyin û hesaniyê car caran, ji hevra xerib têne hesabandin. Her Rêxistinek Kurd ji xwera terhek girtiye û diçe. Bi min ev tişt xeter e. Lewra zman yek e û malê her kesi ye. Gere gûhaziya ditina, navê mehan û rêngan negûherine. Dîxwazim vê rewşê bidme nişan:

MEDYA	KOMAL	RÎYA AZADÎ
1-Çile	1-Çile	1-Çileyê Paşin
2-Sibat	2-Sibat	2-Sibat
3-Newroz	3-Adar	3-Adar
4-Nisan	4-Nisan	4-Nisan
5-Gulan	5-Gulan	5-Gulan
6-Puşber	6-Heziran	6-Heziran
7-Tirmeh	7-Tirmeh	7-Tirmeh
8-Tebax	8-Tebax	8-Tebax
9-Îlon	9-Îlon	9-Îlon
10-Cotmeh	10-Çiri	10-Çiriya pêşin
11-Çiri	11-Têşrin	11-Çiriya Paşin
12-Befranbar	12-Kanûn	12-Çileyê Pêşin

BI DITINIYA MIN YA RASTÎN

(Bi taybeti Kur-dên sor wi terhi kar tinin)

1-Befranbar	7-Tirmeh
2-Reşeme	8-Puşber
3-Adar	9-Gelerezan
4-Cotmeh	10-Kewçêrin
5-Gulan	11-Sermawez
6-Xermanan	12-Gelawêj

D1 çar demên salê da rêza mehan û naverok û maneya mehan ji wiha ye:

A) ZIVISTAN: Şev kurtin roj dirêjin, berf û baran e, teyrok û tofan e, ewr û mij û moran e, li hawir ji serma mirov dicemide, di qerise. Meha pêşin Gelawêje. Gelawêj navê wê stêrê ye ku di destpêka vê demê de, di çirise. Meha duduyan Befranbar e. Berf bi taybeti di vê mehê da dibare. Meha sîsêyan Reşeme ye. Bi rasti ji ev meh, mehek reş e. Ji berf û baranê hawidor di nav sermayê da maye. Asiman reş û tari ye.

B) BIHAR: Pişti reşahi yê, xweşi û şinahî, kêf û seyran destpêdike, dil germ dibin, xwin li jiniya di kele, av diçe dar û beran, gul di feqin, beyar têne cotkirin, tov têne reşandin. Tam di roja bist û yekan de şev û roj dibin weki hev. Yekem meha Biharê Adar e. Dema ku av gumre dibe cobar di firfirin û dar û ber tê av dibin ew dem, meha Adarê ye. Meha duwen Cotmeh e. Yani cot di vê mehê de dibe. Erd di Adarê de rewa diçe ji cot re amade dibe. Meha sîsiyan: Gulan e. Gul şin dibin, di feqin behna gulawidor diçe.

C) HAVIN: Dinya germ dibe. Hilm û gulma germinê ber bi asimana ve bilind dibe, hildikşe jorê. Giya û dexl zer dibin, xerman û bêder amade dibin, germa rojê weki tir dide nav seran. Pûş û pelaş hişk dibin, pel diweşin, giya dibe pûş. Meha ewl Xermanan e. Genim û giya û ceh û nisk û garis divê ku ji qalkê xwe bêne der. Xerman sererast dibin. Di vê mehê de xerman û bêder bi genim tiji dibin. Meha Duwen Tirmeh e. Nav li ser e. Roj di van rojan de tir dide nav ser û çavên mirovan, xwê ji êniyê berjêri xwar dibe. Meha sîsiya, Puşber e. Giya hişk dibe dibe weki pûş. Ji zeviyan herkes pûş berhev dike.

D)PAYIZ: Dem ber bi Zivistanê ve diçe. Hewa hêdi-hêdi sar dibe. Dest-



SALNAME 1992 CALENDER TAKVIMI

Jan/Jan	Feb/Feb	Mar/Mar	Apr/Apr	May/May	Jun/Jun	Jul/Jul	Aug/Aug	Sep/Sep	Oct/Oct	Nov/Nov	Dec/Dec
1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31	1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29	1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31	1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30	1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31	1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30	1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31	1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31	1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31	1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31	1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31	1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31

MEDIA

Orduyê Bêxweşî Hêri Tel: 824 ÇALABOLU / ÎSTANBUL Tel: 818 47 78

pêka baranê ye. Şîqa şîqa asimane. Rez bî tiryê çêbûyi dî barin. Kew derdî-kevîne çêrê, lî teht û znara qebe-qeba kewane. Serma bî ser jîyanê va xwe berdide. Meha yekem a Payîzê ji Gele-rêzan e. Dema ku rez dîçînin, mahsere amade dîbin, kureya agir bî şîra tîrî dî-kele, dîms çê dibe. Meha duwem, Kew-çêrin e. Kew û Mêkew û Susîk û Rî-bat dîçne serê kendal û znara dîxwî-nînin û dîçêrin. Meha paşîn Sermawez e. Berê salê dîkeve zîvîstanê, serma û germa çîhê dîbin, sar û germ lî hev du-gûhêzin. Fêki û xwarînen zîvîstanê û genim dîkevîn kuwaran û kîler şên dîbin.

Çawan ku me lî jorin dit, roj û meh û demên rojîjmêra kurdi yeke-yek bî zman û naveroka kurdi va grêdahi ne. Tû navek mehan, biyanê dema xwe nin e. Nav lî gora rewşa deman hatîne danîn. Dem ji, lî ser hemdemiya mehan damezra ne. Diyare çanda Îslamî ji, gelek tîşt ji rojîjmêra kurdi hîlkîriye.

Regê oldari, pîştî dema yekxudani destpêkîriye. Dema wexta pîrxudani her qewmekî, lî ser bawermendiya xwe jîyana xwe bî gora rewş û mecalên xwe pêkaniye. Tê gotin ku Newroz ji sersala kurdan e. Qabile ku ev ditin ji rast be. Diroka Newrozê ji, bî çî terhi bête qîsekîrîn bîla bê, bûyer bixwe bûyerek netewahiye. Dîsan (BÎ: 612) beri zayîna Îsa bî 612 salan kurda xweşî û şahîyek ava kîrîne û jêre go-tîne destpêk. Ev roj ji, rojek pîroz e. Ji ber vê yekê ji, kurd jî roja 21'ê adarê re bibêjîn sersal, heqê wane.

Îro dîvê hemû rewşenbîrên kurd hewl bîdne xwe ji bona sererastkîrîn û yekkîrîna rojîjmêra kurdi. Diyare yek-kîrîna xasyetên netewayeti ne karekî hesan e. Eva bî xwe hewcedarê bîngehek netewahiye. Xebata dî ware çand û hîner û dirok da, dîvê rexîstînek netewî pêk bîne. Ew rexîstîn ji, bî qîma herkesî be, herkes pê bawer be û alîkarê wê be. Bîryar û kîryarên wê dî nivîsandîn û xwendîne de bî kar bê, dî nav gel de belav bibe, her wîha dî vî warîde kemasiya kurdayeti bigêje dawî yê. Rewşenbîr û xwendevanên kurd, nivîskar û hînermend kurd lî ser lê-kolîn û lêgerîna hêjanên kurdevarî bî şehek berpîrsîyari mjulbîn û bîxebîtin.

Dî ware amadekîrîna rojîjmêra kur-di da, dîve xasyeten netewî lî ber çav bîne gîrtî. Amadekarên rojîjmê-ran, xweserîya xasten kurdayeti, jî bir nekî. Nav û rêza roj û mehan rast bîdne nişan û alîkarê nivîskarên nû-geyîştî bîn. Rojên ku dî diroka kurdan de gîringîn, sersal û dorsal û rojbûn û biranînên netewî gîştî, dî hemû rojîj-merên kurdevarî de wekî hev bîkar bîn, ta ku kurd jî bîzanîbîn gelo rojen gîringên sale kî jane bî çî aweyî dîve bîbîr bîn. Roja şehîdan, rojên serhîl-dan û berxwedanan, rojên serketîn û tekçûnên netewî, rojbûyînen serok û Rêberên kurda, bûyerên sîyasî yên

herçar beşên Kurdistan, gereke ku, di rojîmêra kurdi da, baş bê nişandin. Di van rojên giring de kurdi bî tevayî bîbîn yek dil û yek can.

Iro, pîr mîxabîna ku gelek bûyerên kevîna di dorsaliya xwe da bîbîr nayên, gelek jî wana jî, ber ku sal û zeman têda derbas bûye, jîbîr bûne. Yêna gelekîna jî, roj û sala wan bî rastîna naye zanîna. Kronolojiyek sistematîk di derhaqê bûyerên netewî yêna kurdi da tûne. Ev kemasiyek mezîna e. Her wek rojîmêra kurdi, di ware demjîmêra (sîet) kurdi da jî, rêyek yeqîn û bawer pêkîrî xuya nake. Elefranga û Eletûrka di demjîmêra kurdi da jî, bîkar tê û dibe sedemê tevliheviyek mezîna. Kurd jî demên paşî nivro ra nabêjîna '13, 14, 15, û êdî...' Lê dema ku qela van wextan tê kîrîna, dibêjîna yekê paşînivro, dehê şevê, çarê sibê û êdî... Herçend rojek 24 beş bî jî, jî yekan hetanî 24'an demjîmarîna di nav kurdan da hêj jî, cih negîrtî ye. Lî vîr da tîştêk dîna jî, dîvê bîbîr bê ku, di zmanê Tîrkî da "çeyrek" wekî jî çara yekê sîetê tê qebulkîrîna û ev bîwêj (terîm) bî xwe jî, jî zmanê kurdi gîştîye Tîrkî. Kurd jî, dibêjîna "çarîk" yanî jî çaran yek.

Dîsan pîr mîxabîna ku di demjîmerîya zmanê kurdi da, nîha jî, navê "deqîqe" û "sanîye" û "salîse"yan bî kurdi nayê zman. Lê kurdi van bîwêjên, car-caran bî kar tîna, jî ber ku di kurdi da navên wan deman hêj ne dîyar e.

Kurdi jî mêj va, bîrcan jî, nasdîkîna. Astrolojî (Stêrzanî) bî terhek teng di nav kurdan da jî cih gîrtîye. Rewş û tevgera stêrkan, xêr û bera ku jî wan tê der, sêredarî û falzanî, bî gora serborîya stêrkan, dêhatî û serpêwerên mîrovan di stêrkanzanî ya kurdan da jî, xwe nişan daye. Bîrca Beran, Bîrca Cewîkan, Bîrca Şêran, Bîrca Mar û Masi û Ga, Karîk û Kevcaran, car-caran ketîye nav mîjûlahiyên babetên kurdi. Lê di bîrcên kurdi da destpêka bîrcê di

kîjan roja mehê da be, kutahî jî, di wê roja meha lî pey da tê.

Navê çend stêrkên ku kurdi nasdîkîna evîna: Gelawêj, Zuhêl, Zuhat. Zuxre, Spêde, Perwîn, Leylan, Beranberî, Muştêrî, Sîrîya û bê şîk çendên di jî hene. Bî taybetî Meleyê Cîzîrî di dîwana xwe da car-caran navê wan stêrkan dibê. Tirêj jî, di helbestêk xwe da dibêje "Stêrka sibê (Spêde) fereca xêrê ye". Bê guman ger di vî wari de jî, lêkolîna û lêgerîna bîbe, pîspor û lêzan lî ser vê pîrsê bîsekîna, wê gelek tîştên nu jî, derkevîna û emê pê bîzanîna.

Ev gotîna me yêna jorîna, bê şîk jî rexnabariyê ra amadene. Dîbe ku me ne rast jî vê pîrsê danîbe. Lê armanc ne ewe ku tîştê me danî wek rastî bête qebulkîrîna. Armanc ewe ku ew kesên di vî wari de şareza û zana ne, rastî û bawerpêkariyê binîna zman û şrove bîkîna. Her wîha zanîyariyek di vî wari de jî, sererast bîbî.

Aqîl di serê mîrovan da wek bîzmareke ye. Heta hîndîkek lî serê mîrov nekeve, nakeve serê mîrovan...

Pêşgotîna Arnavût'ana...

BI EVINÊ AVDAN TOVÊN VÎ AXÊ

Bı evinê avdan
 Tovên vi axê
 Hêvi çandın
 Spikerên diroka xwe
 Aj bı aj mezin bû, gul da,
 Hat birrin
 Hat kesaxtın
 Ê ji nû ve guli da
 Binêre wa disa dı meywê de
 Kar nake hışk kırın
 Birrin ji kar nake.
 Lewra kok dane,
 Kûrahiyên axê
 Lewra hatine avdan
 Bı eşqan, bı evinan
 Bı xwinên sor e sor
 Bejn da bı avdanê
 Zêde bûn bı heskırinê
 Evindarên aştiyê
 Yên ku şer dıkın
 Xwin bı xwin
 Dıran bı dıran
 Ê can bı can

Mazhar KARA, AMED
 Werger: Xefûr BIŞÊRİ
 Jı Kovara Roja Medya

Komara
Mahabad
22.1.1946

Dı Diroka Gelê Kurd Da Rojeke Bı Qedr û Qimet

Komara
Mahabad
22.1.1946

Sirvan/Kurdîstana İnan


Paş hatına leşkerê Sor lı navçeyên Bakûr a İnanê û hêzên İngiliz û Emeriki lı navçeyên Başûr a İnanê, diktatoriya Rızaxan rûxa û leşkerê İnan jı hev belav bû. Dı devrana hukumeta Rızaxan da lı Kurdîstana İnanê, weki Kurdîstana Tırkiyê, cıl û lıbasên Kurdi, axaftına Kurdi hatı bûn qedexe kırınê. Her usa nefi kırına Kurdan jı bajarên dın a İnanê, zılm û zordariya leşkerên Rızaxan tu sinor nasnedıkır. Bı sedan tekoşerên Kurd, dı zındana diktatoriya Rızaxan da şehid bûn.

Bı hatına Leşkerê Sor, jı hev belav bûna ordiya İnanê, bê çek kırına jendirme jı aliyê xelkê Kurd va, xebata azadiya Kurdistan ber bı pêş çû. Van tıştan gelê me teşwiq dıkır, ku careki dın hukmê welatê xwe bigre destê xwe, qedera xwe bı xwe tayin bıke.

Mıntıqa Mahabad, Bokan û derûberên wan, navçeyeki taybeti bûn. Tu hêzên biyani dı vê navçe da tune bûn. Xelk bı xwe emniyeta vê navçeyê dıparast. Çend ronakbirên Mahabadi, bı alikariya çend pêşverûyên Kurden Kurdîstana İraq, ku dı sala 1939'an da lı Sulêymaniyê rêxıstına "Hıva" damezrandı bûn, dı 16. 8. 1942'an da "Komeleyê Jıyaneweyê Kurdistan" (Je-Kaf) saz kırın.

Herçend gor rewşa hunduri û navnetewi hewce bû, ku rêxıstneki eşkere, xweyiya bernamayê vekırı, şûna Komela kar û barên cıvaki û siyasi bigre destê xwe. Lê belê bili Komela dı navçe da tu hêzên siyasi û rêxı-

tnek tune bû, ku bıcare bı rêva bırina vê mintıqayê bigre destê xwe. Jı ber vê yekê Komela 4 sal dı vê navçe da hukma xwe ajot. Em dıkarın bêjin, ku lı Mahabad û derûberê wi da otonomi hatıbû damezrandın, gelek kar û barên siyasi û cıvaki hatın kırın.



Qazi Mihemed

Rêvabırên Komela tégıhıştın, ku rêxıstına Komela êdi nıkare kar û barên siyasi û cıvaki ya vê navçe bı rêva bıbe. Jı ber vê yekê dı 16. 8. 1945'an da Hızbê (Parti) Demokrat a Kurdistan hate damezrandın û bı vi avayi dı warê siyasi da jıyaneki nû dest pê kır. PDK-İnan kari dı demeki kurt, gelek navçeyên Kurdistan da rêxıstinên xwe saz bıke û xelkê dı bin alayê xwe da bine cem hev.

Xebata Parti dî nava gel da ciyê xwe girt. Bo numune: PDK-Îran, paş damezrandina Komarê, destpêkîr vekirina dibîstanan û peyda kirina mamosteyên Kurd, bona van. Her usa Parti xwendina keç û kur icbarî kîr. Dî vê babetê da "agahdariyek", ku lî rojnama "Kurdistan" dî hejmara yekê da hatiye belav kirin, usa dibêje: "Jî hemû xakê Sabulax (Mahabad) ra tê ilan kirin, ku ser destûra Pêşavayê Mezin û qerara Partiya Demokrat, jî iro şunda bona pêşva bîrîna zîmanê Kurdi, dî dibîstanan da xwendin û nivîsin bî zîmanê Kurdi ye. Her bav, ku kur û keçên wî bî emr jî bo xwendin musait e, pewîst e kur û keçên xwe bîşîne dibîstanê. Elbet her kesek, ku vê fermanê icra neke, tê ceza kirin." (Kurdistan, Hejmar 1, rûpel 4)

Her usa PDK-Îran, dî 1. 1. 1946'an da agahdariya hejmara 32'ê belav kir û got: Hemû tabloyên daire bêne gorin û bî Kurdi werin nivîsin. Bo numune navê dibîstana Pehlevî tê gorin û navê vî dibe KIRMANÇ.

PDK, paş xebata 160 rojî lî meydana Çar Çîra a Mahabadê Komara Kurdistanê ilan kir, dî diroka netewî ya gelê Kurd da cara pêşîn alayê Kurd bilind kir. Dî navçê da wekî Hikumeta Millî a Kurd kar û barên siyasî û civakî girt destê xwe.

Lî Mahabadê dî Meydana Çar Çîra da bî beşdar bûna nunerên hemû mîntiqayên Kurdistan û xelkê navçe, mitîngek hat çêkirin. Dî vê mitîngê da daxwaznameyê jêrin hat ilan kirin. Piştî Qazî Muhammed gotara xwe pêşkeş kir, bona serok komarê hat hîlbijartî û sond xwar.

Daxwazname bî vî avayî bû:

".... Em, ku nunerê hemû çîn û tabequeyên Kurdistan in, dî mitîngekî da, ku me lî bajarê Mahabadê çêkiriye û hejmarê me 20.000 kes in, arzuyê gîştîyê xwe eşkere dikin û jî Komîta Merkezî a Partî Demokrat dixwazin, ku;

— Ev navçeyên, ku niha Kurd tê da dijin, divê serbixwe bin,

— Hîlbijartîna meclîsa şûra, divê dest pê bike,

— Divê hikumeta millî a Kurdistan, vezaret û dairên wana bêne ava kirin,

— Hêzê çekdara millî a Kurd bê ava kirin,

— Lîgel dewletên cînar peyvendiye ticarî û iqtisadî bêne çêkirin.

— Lîgel bîrayên Azerî hevkarî û dostaniyekî qehîm were çêkirin.

Payedar be Kurdistan a azad, Bîjî Partiya Demokrat a Kurdistan, bîjî rêberê xelkê Kurdistan, Qazî Muhammed."


Paş xwendina vê daxwaznamê, Qazî Muhammed gotara xwe xwend. Pêşava dî axaftîna xwe da behsa diroka Kurdistan, şert û zîrûfên vê demê anî zîman û bî vî avayî sond xwar:

"Ez ser navê Xudê û kelimê mezinê Xudê, ser alayê pîroz ya Kurdistan sond dixwim, ku heta axîrin nefes û dilopa xwîna xwe, bî can û malê xwe bona bilindkirina alayê Kurdistan û serxwebûnê têbîkoşim, wekî Reîscumhurê Kurdistan jî yekîtiya Kurd û Azerî ra wefadar bîminim."

Jî damezrandina Komar heya ruxandina vî bî destê nokerên împeryalizm, dî warê siyaseta navnetewî da gelek guhartin çêbû. Şerê Cîhanî a Duduya kuta bibû. Pêwîst bû, ku hêzên bîyanî jî Îranê derkevin. Derketîna Leşkerê Sor jî Îranê, bona hêzên dagîrkerên Îranê rê vekir, ku bî hecetê hîlbijartîna meclîsê, ber bî Azerbaycan û Kurdistan bî rê keve.

Dî Çîleyê Pêşîn a sala 1946'an da leşkerê Îran ber bî Azerbaycanê bî rê ket. Lî Azerbaycanê jî Komara Azerbaycan hatî bû ava kirin. Berê ku leşkerê Îranê bigîje Azerbaycan, rêvabîrên vê komarê revî û çûne Yekîtiya Sovyet. Dî nava çend rojan da bêtîrî 15 000 kes bî destê kewneperest û leşkerê dagîrker ya Îranê va hatî kuştî.

Rêvabîrên Komara Kurd, bîryar dan, ku diji leşkerê Îran şer bîkin. Lê belê, çend roj pêş hatîna ordîya dagîrker, hunek rêber û ke-



Meydana Çar Çıra

sên bi nav û deng xwe teslimê leşker kîrîn. Pêşava Qazi, bo ku şerê birakuji çê nebe, Kurd bî destê Kurd neyên kuştin, xwe teslim kîr û bî vi şiklê paş 330 rojan Komara Mahabad kete destê dijmin.

Dadîgeha Qazi Mahammed û hevalên wi 66 roj dom kîr. Pêşava, di dadîgehê da bî mêrani ber xwe da, ji kiryarên xwe poşman nebû.

Qazi Mahammed û hevalên wi di Meydana Çar Çıra da, ku di vê meydanê komara Kurd hatî bû ilan kîrîn, hatin bî dar da kîrîn. Lê belê bî şehid ketina wan ruhiyeta netewî a gelê Kurd nemîr. Gelê Kurd paş 46 salan, disa ji bona armancên Pêşava Qazi Muhammed xebat dîke.

Komara Kurd, di diroka gelê me da bû-şereki giring e û gelê me bî wi serbîlînd e. Her çend jiyana Komar kurt be ji, kiryara wi gelek giring e û nîha ji di nava gel da dewsa wî her maye.

Di vê dema kurt da Komara Kurd kari, hê-

zê çekdari a Kurd ango, hêzê pêşmerge pêk-bîne; gel û welatê xwe bîparêze. Sîruda (marşa) millî a gelê Kurd **“Ey Raqib”** di dewrana Komar da hat gotin. Îro ji di hemû parçeyên Kurdistanê da weki sîruda millî tê gotin. Jinên Kurd di xebata siyasî û civakî da beşdar bûn. Bî zîmanê Kurdi pirtûk, kovar, rojname hatin çap kîrîn. Xwendin û nivîsîn icbarî bû, 60 şagirt bona xwendin çûne Yekîtiya Sovyet. Bona damezrandina demokrasî di Kurdistanê da, bona şikandina bir û bawerîya şovenîzma Fars, gelek xebat hat çêkîrîn. Bî rêxistinên demokrat yê Irânî û Kurdîstani peyvendi hatin danin. Bona pêş-va birina aborî ya Kurdistan, peyvendiya ticarî lî gel Yekîtiya Sovyet hat çêkîrîn. Komara Kurd tûtûn firote Yekîtiya Sovyet û ji wî 800 000 dolar wergirt. Bî dehan kiryarên din hatin kîrîn, ku gelê me pê vana serbîlînd e.

Gelê me her sal bona biranîna Komar û serokên wî çalaki çêdîke, wana bî bir tîne.

Lihevanin

(BEND-DILOK)

Ahmedê min şivan e
Lî ber keryê mihan e
Pez radîke şevînê
Şivani bê heban e.

Bengin e ha Bengin e
Şal û şapîk rengin e
Çû bû deşta Ruhayê
Ji bavo ra talan bine.

Dew dewê miha qer e
Mih diçêre lî hember e
Kes nikare bîkire
Zêrê zer beramber e.

Dew dikem dew nabe
Jehra mara nav da be
Dûrê xwarîna mêra be
Para beg û axa be.

Dew dikêm rûn tun e
Binê meşka min kun e
Tîşteke tune bîdîm bin e.

Dew dikêm lî zozana
Jê tê bihna pîltana
Min dew bire nav bajêr
Berda nava fîncana.

Derê mala me rez e
Binyê da bêrya pez e
Xezal çûbû pezdosê
Xort lî ser bûn merez e.

Dihok, Zaxo, Kerkûk e
Bedlîs bajar û sûk e
Milanê min biçûk e
Dê lî ber bû pepûk e.

Gorê Xecê heft reng e
Gore ji nîga ra teng e
Xecê keçek çeleng e
Lî ser bû qal û ceng e.

Gulam gula Ruhayê
Xwe nadim aliyê bayê
Ez zanîm ba ji ku tê
Dikevîm binê qefayê.

Gulê hûr e qalînd e
Çavreş e pozbîlînd e
Kulîlka nava gund e
Çiqas bêji ew rînd e.

Berevkar: Bavê Zînar

Jî Wanê heta vîra
Xwîn rîjya ser kevîra
Me wînda kir gelek kes
Der-cînar bav û bîra.

Kebanyê dest qirêjê
Çav hûrê poz dirêjê
Mala mênîk xîrab kir
Notula peza gêjê.

Kurê min kurek baş e
Şal û şapîk qumaş e
Arê kewarê xîlas bû
Jî dayê ra çûbû aş e.

Kurê min tê ji Pîranê
Berê xwe da Îranê
Îran wî qebûl nekîr
Çû cem Kurdê Rewanê.

Memîkzerê keleşê
Serê memîka reşê
Xortê gund lî ser dîn bûn
Xwezgîni sed û şeşê.

GOTINÊN PÊŞIYAN

- * Ew çavê dijminê xwe nasneke, bila bîrje.
- * Ger gul nebe, stiri ji nabe.
- * Her roviyê milletê, nade bî şêrê biyani.
- * Dînê bibe bost (bostan), dijmin nabe dost.
- * Bîra bîraye, bazar xûyaye.
- * Hevalê qirê, nîkîl bî guyê.
- * Aqîl taca zêrine, lê disa dî herkesî da tunine.
- * Kûrmê darê ne jî darê be, zewala darê tunine.
- * Jî weli dîbîn xweli, jî xweliya dîbîn weli.
- * Ber (kevir) lî cihê xwe da rinde.
- * Bîla mîrov dikê rojeki be, lê ne mîrîşka sedsalan be.
- * Eger xîzan tûtîk bîxwe, yan xîzan nexweşe, yan jî tûtîk.
- * Kefa destê reş nebe, tama devê xweş nabe.
- * Xwin nabe av.
- * Ne xwariye, lê bî simbêla wî ve maye.
- * Dîzîk got : "Ez zêrinim", heskê got: "Ez jî jî nava te derketim".
- * Hekîmo tu bî çî hekîmî, got: "Bî êşa laşê xwe".
- * Darê bî stiri nabe gopal.
- * Qenci qenciye dikşîne, xîrabi xîrabiye dikşîne.
- * Mala pîrê xweştîre jî mala mirê.
- * Bî werîsê xelkê neçe kevirê.
- * Du hesp lî ser afîreki naçêrn.
- * Dîlê xweş her lê bîhare.
- * Deve bî kûdikê naye avdan.
- * Roviye gerok, çêtîre şêrê nivîstî.
- * Aqîl hemûyê dîbîre, lê bêbextiyê nabîre.
- * Rûn dî tir da naye veşartî.
- * Jî jî hene, jînkok jî hene.
- * Hîndek cara rev, jî desthîlanê çêtîre.
- * Jîna ne bîjare, esîl xware.
- * Dînê var e, ne mal e.
- * Bê mîn kûrto, bî mîn xûrto.
- * Ber jî besta xîlas nabe.
- * Ecela bîzî hat, nanê şîvan xwar.
- * Dara jîyanê bî xwin tê avdan.
- * Dar tune ba lê nede.
- * Dermanê xwestînê dayîne.

Berevkar: Bengîn

JI NAV EDEBİYATA CİHANÊ: İlya EHRENBURG

F. ŞEXANI

Ilya Ehrenburg, dı sala 1891'an da lı bajarê Kiev hatiye dınê. Dı nav nıvıskarên Rusi yê ku dı warê navnetewi da tın naskırın, cihê Ehrenburg lı rêza pêşin e. Jiyana wi bı gelek guherandın û bûyeran dewlemend e. Pıştı xwendina xwe lı Moskoyayê, ew tevi refên şoreşgeran bû. Jı ber xebatên xwe yê siyasî, gelek caran lı ser hev hate gırtın. Ehrenburg, lı welatên Ewropa'yê pır geriya û demekê dirêj lı Paris'ê jiyana xwe derbas kır. Lı wir wek nûçegehane rojname "İzvestia" xebatê xwe diajot.

Ehrenburg lı destpêkê wek helbestvan derketê ortê, lê paşê derbasî nıvıskariya pexşenê (nesir) bû. Dı salên 1920'an da bı hejmareke bılnd roman û ser-

pêhatiyên wi hatın weşandın. Babetên gelek efrandınên wi lı ser jiyana Ewropa Rojava ne. Wextê Elmanan Paris dagırtın (işxal kırın) dı sala 1940'an da Ehrenburg jı Paris'ê derket çû Moskoyayê. Dı romana xwe "Ketına Parisê" (Paris Düşerken) da sedemên bınketına Fransızan analiz dıke.

Ilya Ehrenburg, dı pıraniyan xebatên xwe da jı helbestvaneki zêdetır nûçegehaneke zırek û serfıraz e. Mırovşırovekırına Ehrenburg bêtır şematik û ser rû ye. Ew bı teqin û lıvin (hareket) dıkare tabloyên rewş û pergala jıyanê pêşan bıde. Lê pır caran nermûş û motıvên bıngêhın yê serpêhati û romanên wi, bı hevkarıya rengan, bı şeweki hêsan û bê nav-

gin (ındırek) tıne ber çavan. Ew ne nıvıskarên nıansên psıkolojıke. Wek nıvıskar û rojnamevaneki rastbın (realist), ew kêm cara hıssıyetê tevi şırovekırın û nıvısen xwe dıke.

Yek jı serpêhatiyên wi "Çermdarê Kal" nımüneyeke jı bo vê yekê. Dı vê serpêhatiyê da, Ehrenburg bı hostatı, wêneyekê jı dema pêşıya şoreşa Oktobrê dıde.

Gelek pırtükên Ehrenburg lı Tırkıyê jı bı alı weşanxana va hate wergerandın û weşandın. Hınek serpêhatiyê Ehrenburg bı zêdeyi lı dervayê welat, bı alı weşanxana va wergerandına bı zmanê Kurdı jı çêbû ye. Hınek eserên Ehrenburg, bı zmanê Kurdı dı kovara Roja Nu da hatiye weşandın.

İ S Y A N

Abdüsselam AYDIN'ın anısına

Yalnızlık başımı dönderiyor
Bir isyan var gecelerimde
Umut kapılarımı tıkayan
Dost insanları düşündükçe başım dönüyor
Gör yüreğimdaki isyanı
Gökyüzünün mavisini
Denizin çırpışları insafsızca
Düşünceye sürüklüyor beni bilemiyorlar
İç çekişler gizli
Şarkılarınmdaki isyanı
unutmasınlar
Beni senden ayıramıyacaklar
Atamayacaklar kalbimden

DELAL

BEDENEKÎ KAL Û WESTAYÎ XWE LI BER DILEKÎ CIWAN Û AZA RANEGIRT
GELÊ KURD WELATPAREZEKÎ HÊJA Û TEKOSÛREKÎ JÊHATÎ WINDA KIR

MIBLÊ YUNUS KAYA JIYANA XWE QEDAND

L. ÖZDEMİR

Mela Yunus ji hêla Bedlisê, navçê Tatwan'ê bû. Welatparezeki giranbîha û bî bir-baweri bû. Li hember dijmin tû cari sere xwe danetani. Weki gola Wan'ê berin bû bawermendiya wi. Ne da ali û her di nav tevgera azadixwazan da lîviya, weki militanek, weki partizanek, weki şarezayeki berêz her tîm li cem gelê xwe bû. Eza dîdit, êşkence dîkşand, zîlm, tedayi, heps û zindanheqaret û lêdan, disan ji, Mela ne ditîrsand û dîlsar nedikir. Dî xwepêşanan da ew he-bû, di mêtingan de ew hebû, car li serê çîyan bû, car ji, li deşt û diyaran... Dî nav xortan de, di nav kalan de, di nav gundi û xwendevan û xebatkarên de her ew hebû, ji xebatê xwe nedîda paş, ber bî pêş her dimeşîya ji bona Kurdistanek azad û demokrat. 40 sal bê sekin û seqar, bî hêvi û

evindar di nav tevgera şoreşger û demokrat da rêz giri bû.

Mela Yunus, yek ji wan welathîzên Kurdistanê bû ku, di medresan de feqîti kiribû, zman û çanda Kurdî baş bîkar tani û di demek kûrt da, xwe ji dîtinên olperesti dîrxîstî bû û bî bû hozanek gelî... Dîlpola û rûken bû. Dî tengasîda hevala tenê nedixîst, di firehi da ji her tîm li xortên nugeyîştî rexne digirt û şîreta li wan dikir. Dî 60'tan de eziyet kîşand, di 70'yan de zehmet dit, di 80'yan de disa xwe li pişt deriyê zindana dewleta kolonyalist û dagîrkerên Kurdistan dit. Li Bedlis hate girtin. Êşkence dit, xwestin ku wi piçûk bîxin, lê nîkarî bûn. Lewra Mele mîroveki netîrs û zana bû. Wi ji bo gel kuştin a xwe ji dabû ber çavê xwe, xwe-roşiyê qebul nedikir. Çi bêjin ku emrê wi tîra wi

nekir, hetani Kurdistan bîbine. Ew hîsret ma di dilê Mele yê hêja de. Kula sala ma di dil da û rojeki bê wefa çavê xwe girt û koçî duwayî kir. Roja 20'ê Sîbatê li dûrê welatê xwe yê xweşvin, li xerîbiyê, li biyaniyê, li bajarê xopanê Stenbol, axirin car ji dost û hevalan re kenî û dîlxweşî da wan û xatîra xwest çû, lê ev çûn ne weki carên dîn bûn, çûneki bê vegehin bû, êdî iro Mela yê me, Seyda yê me ne li nav me ye û bîme ra najî. Bedena wi çû, lê baweri û biranînên wi wê gelek salan her bîjin.

Mela Yunus, piştî duwezdeyê îlon'ê hatîbû Stenbol. Jiyanek zehmet derbas dikir. Serê ewil li bazara cîlan cîl û libas an dikirî û dîfrot. Ta çend salê vi karê kir. Li dawiyê ev kar ji wi dîlhîsa nekîr, dest bî firotana hacetên destkari kir û li ser dezgeyeki

piçûk, lı goşeyeki nexûya, bı serbılındi ji bona
 abori û dervaziya malê perkende froşi kır. Car
 caran digot ku, "Dil û beden bı hev nakın, dil
 dixwaze hınek dın ji bijı, lê beden, xwin û goşt
 xwe lı hemberê vê raperina dijvar nıkarın
 zêdetır bıparêzın. Wer diyare ku paşi lı jiyana
 salan hatiye. Ezê bımrım, lê bawerım ku da-
 mezrana Kurdistan ne dûre. Xweziya mın ji wi
 roja xweş, wê fereca xêrê bıdita, xweziya mın
 bı we xortan, hûn gelek şanaz û bı talih in, dı
 rojên dıhati da hûnê lı Kurdistan serbıxwe û
 aza bıjin. Welatê xwe baş bıparêzın, dijminê
 gelek fêlbaz û gelaş e, fırsend û mecal pê
 bıkeve, wê êriş bıke ser maf û azadiyên welêt.
 Qedrû qimeta azadiyê baş bızanın, ji hevra
 bırabın, yekbın, yekgirtıbın, dı nav çavê neyar
 de, sed kêmasi û xetayê we hebın ji bı kesi
 nedın zanın, kêfa neyar lı xwe neynın. Dema
 ku mırov hevırti be bı hêz dıbe. Dema kû
 mırov bı hêz be, tû kes û bûyerek nıkare aza-
 diya mırov têkbene. Dı gel hev neyarti û
 dûbendi nekın, lı hev rexne bıgrın, hevûdun
 rexnebaran bıkın, lê bı aşiti, bı dostani û heval-
 bendi..."

Başê Seyda, emê şiretê te bıkın gûhar û
 bıxne gohên xwe, hetani ku fırsend, mecal
 hebe em te naşkının, emê bı xeberê te bıkın û
 ew dengê te yê aza wê her dem dı bira me de
 be. Gelê Kurd te ji bir nake. Biraninên te bı
 nırxın. Dilê te bı me ve nebi û rihet razê, em
 hetani Kurdistan şêrin ji bıdestê neyar rızgar
 nekın û gel serfıraz ne be, ji vê rê nagerın û
 destê me ji pêşıra dijmin ve nabe. Em bawerın
 ku Kurdistan wê demek nêzik da azad bıbe.
 Her çend asteng û tengane û dever lı ser rıya
 azadi hebe ji, disa çare nine emê welateki
 serfıraz ava bıkın ku gel têda serbıxwe bıji.
 Gundi, rençber, xort, xwendevan, zehmetkêş,
 keç û pırû cıwan, jin û mêr, em hemû welathız
 destê xwe bıdne hev û ber bı pêş bımeşın. Em
 hêz dıgrın lı ber biranina te. Rehma xwedê lı te
 be Seyda yê delal.



D Ö R T L Ü K

Bu şehrin arka sokaklarında
 Boyasız bir güzel seviyorum
 anacığım
 Yüzüm cama dayalı
 Çift örüğüne can veriyorum

1961
 N. KALE

JI NAV EDEBIYATA KURDI YA KLASIKI: EHMEDÊ XANI (1652-1707)

A. NÛBAR

Ehmedê Xani, dî nav hozanên edebiyata kurdi ya klasiki da, navê heri mezin û bî rûmet e. Wi bî efrandinên xwe yê giranbîha, edebiyata kurdi ya nivisandi dewlemend û bîlind kîriye. Esara wi ya manzûm "Mem û Zin" dî edebiyata kurdi da ciyê serekê digre. Bî vê esera xwe, Ehmedê Xani daye xuyakîrîna ku zîmanê kurdi ji zîmaneki mezin e û bî vî zîmanê jî şakar (gaeser) dîkarîna bîna nivisandin. Mem û Zin'a wi bî xwe, iro bêgotîna wek şakar tê qebûlkîrîna. Ew jî bo gelê kurd bûye çavkaniyeke netewî.

Mîrov dikare bê şik bîbêje, ku kêma şair û hozan hene ku wek Ehmedê Xani dî nav gelê xwe da hatîna naskîrîna û hezkîrîna. Nav û dengê Ehmedê Xani, xwe gihandîye dervayî Kurdistanê jî. Lêger û dirokzanên biyanî qîmeteke gelek bîlind dane Ehmedê Xani û Mem û Zin'a wi. Wek nîmûne em li vî ci bîna gotîna antropolog, entnograf û rohlâtnasê Rûsî Bazil Nikitin: "*Hemû ev şairên han (Melayê Cıziri, Feqiyê Teyran, Melayê Batê-AN) zeminê derketîna hunermendê ku em dîkarîna wek "Firdewsiyê Kurd" bî nav bîkîna, hazîrkîrîna. Dama me behsa amadekîrîna hestê netewî yê kurdi kîrîbû, me navê Ehmedê Xani bî bir anîbû, em vî wesfê han li wi layîq dîbinîna, jî ber ku pêvajoya (process) amadekîrîna ruhê netewî, ciyê xwe yê rastîna; bî şirovekîrîna helbestîya bedew, dî esera wi da dîtîye.*"

JİYANA EHMEDÊ XANI

Ehmedê Xani dî sala 1652'an da li dorhêla Hekariyê (Çolemêrgê) hatiye dî-nê, dî sala 1707'an da li Bazidê muriye. Dî derbarî jiyana wi da agahdariyên gelekî fire tunene. Lê wi bî xwe nivîsiye ku ew dî sala 1061'ê hîcrî da (1652 miladî) jî diya xwe bûye. 44 salî bû ye Mem û Zin qedandîye û dî 1094'ê hîcrî (1685 miladî) da Nûbar nivîsiye.

Ehmedê Xani, qala jiyana xwe ya şexsî nekîriye lê jiyana gelekî kurd ya sedsalên navîn, pêwendiyên siyasi, aborî, civakî û çandî, bî hostatî lî ber çavan raxîstîye. Eserên wi, jî me ra wisa diyar dîkîna ku Xani

mîrovekî ronakbîr, xwedîyê kultureke helbestê ya bîlind, alîm û zanayekî dîrbîn bûye

Berî Ehmedê Xani, hozanên wek Eli Herîrî, Mela Ehmedê Batê, Melayê Cıziri, Feqiyê Teyran nîmûneyên edebiyata kurdi dabûn û li Kurdistanê baş dîhatîna naskîrîna. Lê edebiyata kurdi, bî derketîna Ehmedê Xani ra xwe gihandîye tanga here bîlind.

Xani, xwendîna xwe ya dînî lî Cızirê girtîye. Paşê çûye Bazidê û lî wir medresek vekîriye û bûye dersdarê vê medresê. Piştî mîrîna wi, şagîrtê wi Îsmailê Beyazidî şûna wi girtîye. Ehmedê Xani lî nezîkî vê medresê hatiye bîna xîrîna. Jî sedsalan vîrda, gelê me mezêlê Ehmedê Xani wek ziyaretgeh qebûl kîriye.

BERHEMÊN EHMEDÊ XANI

Hozanê mezin Ehmedê Xani, 3 berhem lî dî xwe hiştîne. Wi dî hemû nivîsên xwe da pêşîngî kîriye. Ferhengoka kurdi ya pêşîna wi amade kîriye, bî navê NÛBAR (yan jî Nûbara Bîçûkan). Dîsan yekemîna car wi destnake kurdi ya zargotîna çirokdestana Memê Alan bî ramanên hevçaxî ve çêkîriye; bî motîvên siyasi, çandî û netewî xemilandiye û ew tevî edebiyata kurdi ya nivisandi kîriye. Wi navê vê esera xwe daniye Mem û Zin. Berhemeke wi ya dîna jî E-qida Îmanê ye, ku jî helbesten dînî pêk tê.

Mîr Celadet Bedîrxan (bî imza Herekol Azîzan) dî kovara Hawarê da (Hawar hejmar 33) nivîsiye ku Ehmedê Xani, pîrtûkek lî ser coğrafîyê nivîsiye. Heta nîha ev pîrtûk derneketîye meydanê. "Lê eger wi lî ser coğrafîya û astronomîyê pîrtûkek nenivîsandîbe jî, dema ku mîrov Mem û Zin'ê dîxwîna têdîgihe ku ew dî van babetan dajî gelekî zana bûye." (*Ferhat shakely, Kurdish nationalism i Mem û Zin av Ehmedî Xani, Stockholm 1985, rûp. 13*)

NÛBAR

NÛBAR Ferhengoka kurdi ya yekemîna e. Xani 33 salî bûye dema ev pîrtûka dersê nivîsiye. Nûbar jî 14 beşan pek tê. Nivîskar dî destpêka her beşê da, lî ser jiyandîna, dîtin, bîr û bawerîyên xwe; şîret û pêşniyazên xwe dînivîse û dîra bî hostatîyeke pedagojîk, bî

şeweyeki manzûm (helbestki) peyvên erebi-kurdi, kurdi-erebi lı pey hev rêz dıke.

Ehmedê Xani, dı destpêka Nûbarê da dibêje ka wi çıma ev pirtûk hewce ditiye û nıvisandıye:

*Ne ji bo sahib rewacan
Belki ji bo biçûkêt Kurmancan*

*Weki ji Qur'anê xilas bin
Lazım e lı sewadê çavnas bin.*

Ev çend sed-sal in, ku Nûbar lı Kurdistanê, dı xwendına medresa dini da wek pirtuka dersê tê xwendın. 25-30 sal beri nıha, pıraniya zarokên kurd, Nûbar dıxwendın û gelek caran jiber dıkırin. Lê nıha, ji ber ku şına xwendına medresa dini, xwendına bı zmanên resmi yê welatên kolonyalist gırtıye, êdi Nûbar wek berê geleki nayê xwendın. Lı gel zordestiya kolonyalist û nijadperest; nıvisandına wê bı tipên erebi, sedemeki dın yê nexwendın û naskırına Nûbarê ye. Nûbar cara yekemin isal bı tipên latini û erebi bı hevra, lı Stockholmê ji aliyê weşanên Roja Nû va hatiye çapkırın.

MEM Û ZIN

Dı vê berhema xwe da, Êhmedê Xani, wek ronakbireki mezın ê sedsala xwe, gelş û diwariyên cıvata kurd, daxwaza gelê kurd ji bo jıyaneke çêtır bı hostati anıye zıman. Parvebûna Kurdistanê dı navbera dewleta Romê (Osmani) û dewleta Safavi (Farsi) da; binehevkırın û neyekbûna eşirên kurdan ku her yeki ji aliyeki lı cem van dewletan ci dıgrın û wek hêze tampon lı hember hev şerdıkın; tûnebûna mireki kurdan, hemû ev gelş û kêmasiyên han dı dilê Xani da bûne derd. Lı gor baweriya wi, eger kurd bıbin yek û padşaki wan hebe, we çaxê gelê kurd wê ji bındestiyê rızgar be, xwendın, nıvisandın, ilm û huner wê pêşkeve.

*Kurmanc ne pır dı bêkema lın
Emma yetim û bêmedal in,*

*Filcumle ne cahıl û nezan in
Belki sefil û bê xudan in.*

*Ger dê hebûya me ji Xudaneke
'Ali-keremek, letifedaneke,*

*'İlm û huner û kema lı iz'an
Şı'r û xezel û kitab û diwan.*

*Ev cıns bıbûya lı ba wi me'mûl
Ev neqd bıbûya lı ba wi meqbûl,*

*Mın dê 'elema kela mê mewzûn
'Ali bıkıra lı banê gerdûn*

*Binavê ruhê Melê Cızırı
Pê hej bıkıra 'Eli Heriri*

*Keyfek we bıda Feqihê tTeyran
Hetta bı ebed bımayi heyran.*

Herçend Mem û Zin destan-çirokeke evini (eşq) be ji, lê Ehmedê Xani ew kıriye behane ji bo ku fikir û ramana xwe, daxwaz û pêşniyazên xwe bı vê esera edebi dı nav gelê Kurdistanê da belav bıke. Û kıriye. Ev 300 sal in ku gelê me ji Ehmedê Xani û berhemen wi hez dıke.

*Da xelık nebêjıtın ku "Ekra d
Bê me'rifet in, bê esl û bınyad*

*Enwa'ê milet xudan kıte b in,
Kurmanc tenê dı bı huse b in"*

İro kes nıkare bıbêje "Ekra d" (kurd) bê me'rifet û bê bınyad in. Dı dirok û edebiyata kurdi da berhemên E. Xani bı xwe ji bûne çavkaniya serbılındı û serfiraziyê. Gelê me, wê vi hozan û welatperwerê xwe yê mezın tucar jıbir neke.

Mem û Zin heta nıha gelek caran hatiye çapkırın. Lê mıxabın ku kêm hatiye wergerandın ser zımanên bıyani.

Mem û Zin cara yekemin dı sala 1917'an û 1919'an da lı Stenbolê bı pêşgotına Hemze hatiye çapkırın. Her ew çap dı sala 1947'an da lı Helebê û 1954 - 1958'an da (du caran) lı Hewlêrê bı pêşgotına Giwi Mukriyani û dısan dı 1962'an da ji aliyê Kurdologa Sovyeti M.B. Rûdenko hatiye çapkırın. Rûdenko bı xwe û profesora Qanatê Kurdo ji vê çapê ra pêşgotın nıvisine. Çapeke dın ji aliyê M.E. Bozarlan dı sala 1968'an da lı Stenbolê hatiye çapkırın.

ÇAVKANİYÊN VÊ NIVISÊ:

- 1) Herekol Azizan, Klasikên Me, Hawar, hej. 33
- 2) Qanatê Kurdo, Tarixia Edebiyata Kurdi, Stokholm, 1983
- 3) Kemal Burkay, Kürdistanın Sömürleştirilmesi ve Kürt Ulusal Hareketleri, 1978
- 4) Bazil Nikitin, Kürtler, çap 2, 1986
- 5) Ferhad Shakely, Kürdisk nationalism i Mem û Zin av Ehmed-i Xani
- 6) Ehmedê Xani, Nûbar, Stokholm, 1986
- 7) Ehmedê Xani, Mem û Zin (wergera M.E. Bozarlan), Stenbol, 1975

İŞEV BAVÊ WE NAYÊ

Êvar e pîr sermaye. Pûsi li ser berfa çil û qerqaş pûlpûli bûye; weke berfa sedef dibiriqe. Hinek gundi dî çixîra berfê da derbas dibin Dengê lingê wan, weki ereba bê sabûn çirke-çirk jê tê. Gundiyên mayin jî ketne malêd xwe, soba dadane û xwe li ber soba germ dîkîn. Dûyê serginan jî pîxêriyên soba, weke mara xwe li hev dîalînin û dîkîşin ezmana. Gava gelek bîlind dibin, li jorê dibin ewreki boz - weke ewrê berfê- dî binê xwe da li gundê Piranê mêze dîkîn.

Rûyê ezmana yê n ku dîxuyên jî usa zelal e, minani ziv. Jî sermayê nebe mirov hez dîke ku bî salan li vî xaliça şî n bînhêre. Jî dengê çivîk û kûçikan bêtr ewqas sewt nayê bîhistin. Lê car caran kundo, dibê; pûpû, pûpû. Hêdi hêdi ew jî lez dîkîn jî xwe ra sitarek bîbin. Kûçik dîkevî n qelax û pîxêriyên germ, çivîk jî xwe davêjin kadinên kayê û gihayê loda.

Îso bî taxûka xwe yê hespa va - weke her êvara- jî bajarê Kopê tê. Gava hat binê gund, çînge-çîngê zengil û gemê hespan kîrî n hêwirze. Pîrxepîrxê hespan in; hulm, weke golêd germavê jî hespan qîloz dibe. Cemedê dî dev û pozê wana da şengil gîrtiyê û hesp radîbî n çargavê. Taxûk jî li pey wan, weke mara dîkîşe tê.

Helima jîna Îso -weke her êvara nêzikê hatîna Îso- agir berdaye sobê û derketîye Pala Xaç, li rêya mêrê xwe dînhêre.

Îso, tîmî êvara ku tê nêzikê gund, zane Helima jîna wî li hêviya wî ye û jê ra zad germ kîriye. Îso jî aliyê Pala Xaç bî eşq dînhêre, êdî kêfa wî xweş dibe û dengê xwe bîlînd dîke. Li hespa dîqîre, dîbe: "Deh, deh purrrr hespê kurê kerê ezê...!"

Gava nêzikê Helo dibe, gazî wê dîke:

- Helim can, Helim can, rhê min, gelo te qe çayê germ kîriye? Xwedê zane îro dilê min pîr çayê dîxwaze.

Helime jî destê xwe berhev ra derbas kîriye, dibêje:

- Malşewtîyo! Ne tu qefîli, hela were ber tendûrê parîki xwe germ bike, paşê çayê bîxweze. Hema çay jî û nan jî hazîr in.

Îso bî kubarî dorberê xwe dînhêre, wan kesên ku li taxûka wî sîwar in, jî wan ra dibêje:

- Hûn dîbinî n, jî n dîbin bîla weke Helo bî n. Jî esîr da hêviya min e. Jî min ra her tîşt hazîr kîriye. Çay dibêjî çay, nan dibêjî nan.

Îso rêwiya jî taxûkê peya dîke, geman jî serê hespa dîşqîtîne, hespa dîkîşîne tewlê ser afîrê wan û vedîgere ber tendûrê. Lingê xwe dî tendûrê da dîalîqîne. Qasek xwe germ dîke. Nanê xwe dîxwe, çixîra xwe dîxe orta herdu lêva, gulmek lêdîxe û çavê zaroka dînhêre, dibêje:

- Lawo, welle îro çavê min bî

pûrteqalê erzan ketin. Min telb kir bîstînim, lê hema ez bî lez bûm. Soz be ezê sibê wera pûrteqala bin im.

Zarok şadibîn, direvîn dîkevîne nava ciyê xwe. Bî tewa lî hev dîxîn, dibêjin: "Welle bawo wê sibê jî me ra pûrteqala bine". Xêlek derbaz dibê zarok xewra dîçîn.

Îso radibe, ber bî nivîna dîçe, ku bîkeve nava nivîna, Helime gazi dîkê:

- Hey malxîrabo, wan gorê xwe derxe, ezê bîşom. Gorê te jî qirêjê êdî rîzyan e. Qirêj lî ser lingê te bûye, wêkê kerme. Ca ra be xwe bîşo...

Îso lî Helimê dînhêre, bî devekî ken dibêje:

- Helime, welle ez îşev gelek westiyam e, tu jî westiya yî, êdî dereng e. Ezê sibê hinek zû werim; him gorê min bîşo, him jî ezê piçek av lî serê xwe bîkîm. Eva du meh in porê min şîl nebûne...

Ew şev derbas dibê. Sibê zû Îso radibe, taxûka xwe hazîr dîke, hespa grêdîdê. Cuhurê wan tîjî ka dîke, davêje ser taxûkê. Rêwiyê xwe hîldîde û dîkeve çîxîra rêya Kopê, dîçe. Ku dîçê bînê gund, lî hespa dîqîre û qamçî dîke. Ew zû dîçe ku êvarê jî zû vegere were mal. Carna ser milê xwe dîfîtle jî rêwîya ra dibêje:

- Van hespan îsal derê min dadan. Herçî qutê zarokên min hebûn, min da bîhayê van. Ev herdu hesp, rojê niv debo ceh dîxwîn. Lazîm e ku ez rojek vala nesekînim. Heta bîharê dî van rêya da herîm û werîm. Bîhar hîndîk maye. Ku kete reşayê, ez jî zîkê van êdî xîlas dibîm. Wê çaxê jî zarokan ra ez êdî dîkarîm tîşt-mîştî

bîkîrîm. Ez çî bîkîm, mala kesibîyê bîşewîte..!

Ew roj lî bajarê Kopê dî meydana hespan da şerek derdîkeve. Gundi bî çek û daran lî hev dîxîn. Îso xwe jî taxûkê davêje erdê, dîkeve navçîtiyê. Dî navberê da gulek lî Îso dîkeve, Îso lî ser berfa sar dîrêj dibê. Xwîna wî a sor berfa sîpî gevez dîke. Îso lî ser berfa qerîsî dîlerîze; can dîde. Hesp û taxûka wî bê xweyî dîmine.

Wê rojê Helime ku karûbarê xwe dîqedîne, ber êvarê derdîkeve ber derî, lî rêya Îso dînhêre. Zad û çaya Îso avîtiye tendûrê û germ kîriye. Herdu zarokên wê jî, lingên xwe dî tendûrê da alîqandîne û hêviya bavê xwe nîn. Carna dîkenî, jî hevra dibêjin:

- Bawo wê îro jî me ra pûrteqala bine... Ewî duhê soz da me. Heta ew neyê em ranazên.

West gelek derbas dibê, êdî dereng e. Êdî sewtên teyr û kelban hatîne bîrîn. Ronahî ciyê xwe jî tariyê ra hîştîye. Mîja tari jî dî ser gund da xepe-xep gîrt. Tu kes lî ber derî tune. Êdî deng jî gundiyan nayê. Carna dengê zûre-zûra gura lî Helimê tesel dibê. Helime him dîtirse, him jî dîcemîde. Jî sermayê dev û dîranên wê hev dîşkênî. Hey carna guhê xwe dadîgre, gelo dengê taxûka tê an na? Lê tu pêjn tunne. Jî tîrsa hêdî derî dîgre. Nirê erebê davêje pîşt derî. Dîçe xaniyê qubê. Bî sewteki nerm jî zarokan ra dibêje: "Rabîm êdî razên îşev bavê me nayê".

Hesen

GÜVEN ATEŞ: "KÜLTÜR VE SANAT MÜCADELESİ ÖZGÜRLÜK MÜCADELESİNİN BÜYÜK VE ÖNEMLİ BİR PARÇASIDIR."

Halepçe bir yara, Halepçe bir utanç...

Halepçe, 21. yüzyıl insanın taşıdığı ve bir türlü üzerinden atma çabasına girmedığı, üstelik yenilerinin yaşamasına da göz yumarak ağırlaştırdığı bir utanç.

Kürt devrimcileri ve sanatçıları, 21. yüzyılın bu utançını onun yüzüne vurmak için, yeni Halepçelerin yaratılmaya çalışıldığı bir dönemde, eylemleri ve sanatsal çabalarıyla kan içicileri teşhir etmenin uğraşındalar. İşte Güven ATEŞ'in Halepçe'nin ardındaki kanlı Newroza denk gelen Diyarbakır'da ki heykel sergisi bu çabalardan biridir.

Güven ATEŞ, Halepçe'yi nede güzel dokumuş... Halepçe tarihe ancak böyle kazanabilir...

Güven ATEŞ'le okurumuz Dilovan'ın yaptığı röportajı aşağıda sunuyoruz.

GOVEND

DILOVAN: Govend okuyucularına kendini tanıtır mısınız?

G.ATEŞ: 1966 Kars Göle doğumluyum. İlkokulu köyde, ortaokul ve liseyi Ankara'da okudum. 1986 yılında girdiğim Haccettepe Üniversitesi Güzel Sanatlar Fakültesi Heykel Bölümünün halen son sınıfındayım.

1990'da Ankara Büyük Şehir Belediyesi ve İnsan Hakları Derneği tarafından düzenlenen "İnsan Hakları" konulu anıt-heykel yarışmasına katıldım.

1991'de Diyarbakır Belediyesi tarafından düzenlenen "Halepçe Katliamı" konulu anıt-heykel yarışmasına katıldıktan sonra, 27 Mart 1992'de ilk kişisel sergimi yine Diyarbakır'da açıyorum.

DILOVAN: Sanat anlayışınızı ve sanat hakkındaki düşüncelerinizi öğrenebilir miyiz?

G. ATEŞ: Heykellerimde toplumsal gerçeklik ve psikolojik dışavurumcu bir anlatım vardır.

Heykel yapmak benim için yaşamın bir gereğidir. Yani, bir ihtiyactır. İşlediğim konu yaşamdır, yaşamın gerçek bedeli ve gerçek yüzüdür. Yaşamın gerçek yüzü ise; Halepçe katliamıdır, Diyarbakır zindanlarıdır, işkencedir, zulümdür, kandır, acıdır... Hep acı...

Sanatın tarihsel sürecini incelediğimiz zaman herşeyden önce sanatçının kendi yüreğini ortaya koyduğunu görürüz. Tüm kaygılarına rağmen önce kendilerini ifade etmeye çalışmışlardır. Sanat bir nevi tarihsel belge niteliği de taşımıştır.

Gerçek bir sanat eseri, kendi döneminin en sağ-

lam kanıtıdır.

Bir toplumun en duyarlı kesimi, kanımca aydın ve sanatçı kesimdir. Günümüzde bu kesimin büyük bir çoğunluğu ayrıcalıklı bir zümrenin ve resmi ideolojinin aksesuarı konumundan kurtulmamışsa, kişiliğini yitirmişse bunu teşir etmek gerekiyor.

Kısa bir süre önce (1988'de) dünyanın ve "büyük" insanlığın gözleri önünde bir katliam yaşandı. Binlerce yaşlı kadın, çocuk vahşice "uygarlığın" en gelişmiş silahları, kimyasal silahlarla, hardal ve siyanür gazlarıyla katledildiler. Suçları Kürt olma. Kuşkusuz bu Kürt halkı için ne ilk nede son katliamdı. Şeyh Sait, Zilan, Koçgiri, Dersim, Diyarbakır Zindanları, Vedat Aydın ve en son Newroz katliamlarıyla devam etmektedir.

Kürt halkının bir bireyi olarak bu acıları yaşayıp onlardan etkilenmemek olanaksızdır. Kürt sanatçısı doğal olarak bu konuda yoğunlaşır ve eserinde bunu deşifre etmeye çalışır.

Yüzyıllardan beri sömürgeci güçler tarafından asimilasyon, baskı, zulüm ve toptan yoketme politikalarına maruz kalmış, dili, kültürü ve değerleri talan edilmiş bir halkın sanatçıları büyük sorumluluklar beklediği düşüncesindeyim. Çünkü "Kültür ve sanat mücadelesinin özgürlük mücadelesinin büyük ve çok önemli bir parçası olduğuna" inanıyorum. Kültür ve sanat etkinliklerimizi ideoloji farkı gözetmeksizin ve ideolojik hesaplara alet etmemek koşuluyla da önemli boyutlar kazandırmamız gerekiyor. Dar grupçu anlayışları, kişisel kap-

risleri, şahsi çıkarları bir kenara bırakıp kültürel ve sanatsal çalışmalarımızı ulusal ve sınıfsal boyutta hızla ilerletmek mecburiyetindeyiz.

Sanatçı için, duygusal davranış olayı dramatize ederek sloganıcı bir anlayışla sanat yapmaya çalışmak, özcesi sanatçının kendi heyecanını bastırmak ve kendini tatmin için sanat yapması, geçici bir etkileme sağlamaktan öteye gitmez. Örneğin bir Halepçenin heykelini yaparken, onun öyle yapmak gerekir ki bir Amerikalı, bir Rus, yada dünyanın başka yerinden biri buna bakarken o katiâmın acısını yüreğinin ta derinliğinde hissedebilsin. Buda, görsel sanatlarda ancak evrensel bir dil oluşturmakla mümkündür.

Bütün olumsuzluklara rağmen yaşamı sanatın kendi iç sorunlarıyla bütünleştirip bir sanatçı sorumluluğu ve duyarlılığıyla evrensel bir heykel dili oluşturma çabasıdayım.

DILOVAN: Bu serginin sizin için özel bir anlamı ve Diyarbakır'da açmanızın özel bir nedeni var mı?

G.ATES: Bu serginin ilk kişisel sergim olması benim için önemli bir olaydır. Bunun Diyarbakır'da açılması ise çok daha anlamlı ve önemlidir. Heykellerimin gerçek alıcılarının, ki satın alıcı anlamında kastetmiyorum, doğal olarak kendi halkım olması nedeniyle önce Diyarbakır'da açmak istedim. Bir diğer nedende bu tür etkinliklerin burada yapılmayıdır. Bu alanda bir boşluğun olması ve halkımızın bu yöndeki açlığını az da olsa giderme çabasının bir başlangıcı olması amacıyla sergimi burada açtım.

DILOVAN: Sergiyi açma girişiminiz engellenmeye çalışıldı mı, ya da bir baskıyla karşılaştınız mı?

G.ATES: Sergiyi ayın 25'inde açacaktık. Sergi açmak için Emniyetten, Valilikten izin almak gerektiğini bilmiyordum. Ankara'da kaldığım için Belediyein sanat danışmanı arkadaş benim adıma izin almak için dilekçeyle emniyete başvurmuştu. Sergiyi "komşu bir ülkeyi rencide edeceği" gerekçesiyle izin verilmedi. Daha sonra şahsen başvur-



dum. En son heykelleri incelemek için görevli bir heyet gönderip tutanak tutacaklarını söylediler. Tabii bu arada çalışmalarımızda aksıyordu. Ayın 26'sında Diyarbakır Güzel Sanatlar Galerisi Müdürü ve bir polis memuru gelip 23 ayrı heykeli tam bir polis mantığıyla tanımlayıp tutanağa geçtiler. 27 Mart günü "öğüt", "öneri", gözdağı ve tehdit sonrası yazılı izin belgesini alabildim. Aynı gün afiş, davetiye, galerinin düzenlenmesi ve heykellerin taşınması işlemlerini birarada bitirerek akşam saat 6'da sergiyi açtık.

DILOVAN: Kürt Sanatının bugünkü durumu ve Kürt Sanatçıları hakkında ne düşünüyorsunuz? Sizce Türk aydınlarının ve sanatçıların bundaki konumu ve görevi nedir?

G.ATES: Kürt kültürü ve sanatı gerçekten uygarlıkların oluşumlarında kaynaklık yapmış geniş ve evrensel bir kültürdür. Mezopotamya Uygarlığı'nın bu özelliği bugün bütün tarihçiler tarafından kabul edilmiş bir gerçektir. Ancak bu kültür yüzyıllardır talan ediliyor ve bugün yok olmakla karşı karşıyadır. Bu sömürgeci ve talancı ideolojye "aydın", "sanatçı", ve "bilimadam" geçiren Kürt yada Türk kökenli insanlar ne yazık ki alet olmuşlardır, bu yönde çarpık bir ideolojinin yanında yer almışlardır. Kuşkusuz bu çarpık, talancı ideolojye az da olsa Kürt ve Türk, karşı çıkan aydınlarımız ve sanatçılarımız varolmuştur.

Kanımcı, burada Kürt aydın ve sanatçılarına da, Türk ve aydın ve sanatçılarına da zor ve önemli görevler düşmektedir. Çok büyük sorumluluklar ve özverili çalışmalarla bu mekanizmaya karşı durmak gereklidir. Özellikle Kürt aydın ve sanatçıları kendi değerlerine sahip çıkmak ve onu ilerletmek zorundadır. Şunu da eklemekte yarar görüyorum; asimilasyon, baskı ve jenosid politikalarına alet olmuş Türk "sanatçı"sı ve "aydın" ları bu utançla tarihin yargısından kurtulamayacaklardır.

Kanımcı, burada Kürt aydın ve sanatçılarına da, Türk ve aydın ve sanatçılarına da zor ve önemli görevler düşmektedir. Çok büyük sorumluluklar ve özverili çalışmalarla bu mekanizmaya karşı durmak gereklidir. Özellikle Kürt aydın ve sanatçıları kendi değerlerine sahip çıkmak ve onu ilerletmek zorundadır. Şunu da eklemekte yarar görüyorum; asimilasyon, baskı ve jenosid politikalarına alet olmuş Türk "sanatçı"sı ve "aydın" ları bu utançla tarihin yargısından kurtulamayacaklardır.

EZ WELATIM WELAT Jİ EZİM

*Te min efirand wek xwe çêkırım
Te giyan da min, te bî carî kırım
Lî ser singa xwe, te mezin kırım
Hebûna xwe ez jî te hin bûme*

*Bî te destpêkir ew jiyana min
Ez bîte hemim tû birina min
Te rê pêş min kîr, tû ronîya min
Jiyana xwe ez jî te hin bûme*

*Nezan bûm nezan te min zana kîr
Bê rêzan bûm ez te rêzan pîr kîr
Tu bû taca min, te min bilind kîr
Mirovani ya xwe jî te hin bûme*

*Min gemî meşand lî ser behra te
Min agir dada lî zozanên te
Min kewok berdan lî ezmanên te
Pewçûna xwe ez jî te hin bûme*

*Geryan lî cihan, lî ser dengê te
Min dîtin delal lê ne bîqas te
Tû zêr, tû mîrcan, ez mîtrbê te
E vina xwe ez jî te hin bûme*

Laleş Qaso
Girtigeha Diyarbekir
1984

TOPRAĞINA VURAN KAN DAMARLARIMIZ

Çingene kuşu
Kanat çırpıntılarıyla kuş kırımında
Tohum atarken,
Alnımıza düştü zerrecekleri
Beynimiz aldı
Dal-budak
Sarmaladı...
Ateşin korunda büyüttük
Doruğunda
Külde sakladık
Koyunlarımızda...
Hasret'lidir
Küçücük pencerelerinde
Gökyüzüne karşı, büyüyen yüreklerimiz
Civciv sevmelerinde
Akbaba pençeleriyle
Savrulduk
Buğday başağa durmadı
Kuş kırımında
Çığlık-çığlığa Kürdün gelini
Taptaze zılgıtlarla

Arif şiirinde bizi yazdı
Bizi yokladı Neruda
Habercimizdir Maiseyenko
Bizi çizdi tablosunda
Ey toprağında vuran kan damarlarımız
Yoğrulan gözyaşlarımız
Yoğrulduk
Hamurlaşık
Kızgınlığında piştik
Ey ülkem...!
Dudaklarımız toprağın öpünce
Alınlarımız secde etti
Öpülen toprağında
Öpülen alnımız
Apak...
Duyan duymayana iletsin
Gökkuşağı toplayın
Mermiler çarpışıyor ti li li li !!!

A. ADSIZ

JÎ NAV WEŞANÊN NÛ

F. WELAT: "DIYARBAKIR SORU VE 5 NOLU"

Pirtûk belgeyeke giranbîha ye kû dewraneki ji diroka gelê Kurd tine ber çavan. Ev pirtûkê hêja, 5 salên zindana Diyarbekirê, berxwedana şoreşger û welatparêzên Kurd li dîji nazistên Tirk, wek belgeyeki diroki pêşkeşi diroka gelê me ya nivisandî dîke.

Pirtûkê de, bi çend wêne yên xwe Arif SEVINÇ ji cih dîgre. Niviskarê pirtûkê bi nivîsê xwe, A. SEVINÇ ji bi wêne yên xwe diroka zindana Diyarbekirê bi serhatiyên xwe û te-vayî serhatiya hemû şoreşger û we-lathîzên şoreşger şirove dîkin.

Her du şoreşgerê hêja ji, di behs-kirîn û wênekirîna bûyeran da gelek rastbinin; ew çî ditine li hafîza xwe de nivîsine û paşê ev eserên hêja derxîstine meydanê...

Pirtûk cara yekemîn di sala 1987'an da li dervayî welat bi navê "Diyarbakir 5 Nolu", ji alî weşanxana Riya Azadi (Özgürlük Yolu) va hate weşandin. Cara yekemîn de wêne yê A. SEVINÇ ne tede bû. Ev pirtûkê hêja cara duwe-min ji isal bi alî weşanxana DILAN va bi wêneyên A. SEVINÇ, bi navê "Diyarbakir Soru ve 5 Nolu" li Di-yarbakirê hate weşandin.

D. IZOLİ : 'FERHENG, KURDI-TIRKI, TIRKI-KURDI'

Cara yekemîn ji alî "Komela Xwendekaran Kurd Li Ewropa" bi navê "Ferhenga Kurdi-Tirki, Tirki-Kurdi" ha te weşandin. Ev ferhenga ku bi alî D. IZOLİ va hatiye nivisandin, li Tirkiyê cara yekemîn e ku ji alî weşanxana DENG, bi peşgotinê Kemal BUR-KAY va tê weşandin.

Ferhenga D. IZOLİ ji dû beşan pêk tê; Kurdi-Tirki, Tirki-Kurdi...

Di derheqa amadekirîna vê ferhengê da niviskar bi xwe agahdariyê dîde û wiha dibêje:

"Xebata min li ser vê pirtûkê gelek dirêj e. Diçe heta sala 1962. Mela Ev-dilkerimê Silivî zarê Kurdi di dilê min da germ kirî bû. Biryarekê rasti ji dil, 8 sal berê hat.

"Ez kirêkareki fabriqê li dervayî welat, min li xwe ispat kir ku; li êva-ran, serê heftê, dema valahiyê, her car çend rûpel bêne nivisandin, mirov pirtûke ki wisa pêk tine. Gava bêjum; naveroka wi 30.000 bêje, 4.000 biwê-jên Kurdi û nêzi 25.000 bêjê yên beşi Tirki; lêgel lêkolîn li ser dîgelên dînya yê û rêzmani gringîya vê xebatê ber-çav dibe..."

Em bawerî ku, weşanxana DENG bi vê xebata xwe ya giring, ji bo zma-nê Kurdi gavek mezin pêşva avêt.

DR. VET. M. NURİ DERSİMİ : "KÜRDİSTAN TARİHİNDE DERSİM"

Pirtûkê Dr. Vet. M. Nuri DERSİMİ "Kürdistan Tarihinde Dersim" belgeyeke hêja ye, ji bo gelê Kurd. Hinek bûyerên ku giring e, di vê pirtûkê de tê ber çavan. Serihildana Dêrsimê bi şahidên ew rojê di pirtûkê de tê zman.

Pirtûkê Dr. Vet. M. Nuri DERSİMİ, cara yekemîn di sala 1952'an da li Halepê, cara duduyan û sisîyan ji li Elmanya bi alî KOMKAR va û cara çaran ji li Diyarbekirê bi alî weşanxana DILAN va hate weşandin.

Em bawerî ku, ev pirtûkê tû car di pirtûkxana da qimeta xwe wînda nake.

GOVEND

Govende xweş govende,
Govenda me kurdane,
Bermê rabuye bende,
Werin raqsê meydane.

Xelkê feqir nexweş bû,
Dilê go reş bû geş bû,
Basta me çîqa xweş bû,
Govende xweş govende.

Hesreta hezar salan,
Bı rebenê wan halan,
Werin meydana valan,
Govende xweş govende.

Mezrabota ciyê me,
Nûh e ê pêşiyê me,
Heştan çêkir gundê me,
Govende xweş govende.

Qûfla devê me ve bû,
Derdê mezin ji ev bû,
Dıl ji xewê şiyar bû,
Govende xweş govende.

Dilanû çog şikandin,
Bı çepka reqqisandin
Gıranı belûte dın,
Govende xweş govende.

Hesret bû ev serbesti,
Xeber bıdın bı basti,
Şıkır go me ev ji di,
Govende xweş govende.

Govenda me bı qelem,
Navê me derd û elem,
Bıñıfsine Muhterem,
Govende xweş govende.

Ekmen were govendi,
Paşiya emrê xwe medi,
Mırın haq bûye êdi,
Govende xweş govende.

18.2.1992

Mehmet EKMEN
Emekli Nüfus Başmemuru
SİLVAN

SÊRKE BIBIN

Dem û dewra vê dinyayê
Bı çavê me sêrke bibin
Wek dolav tê badayê
Bı halê me sêrke bibin

Çıma hatın em vê dinê
Dinê kırın gola xwinê
Qey qederê Fılstinê
Kurdistanê sêrke bibin

Lı ser welat şer karkırın
Gund û bajar bombe kırın
Pari pari parve kırın
Çar perçê me sêrke bibin

Dixebıtın em bê jinın
Zor û zerpan dikêşının
Ker û qatır nakêşının
Vê bara me sêrke bibin

Vır û vire belafırın
Badıkeve nav ewrın
Zarok kuştın van kafırın
Halepçê sêrke bibin

Ez Ezmanê sıpêle me
Badıkevın gılilê me
Dıl birinim çar perçe me
Perişanım sêrke bibin









EZMAN




Jİ BO ZAROKAN



Seyêki lı navça labirentê de ma ye. Hûn dıkarın rê pênişanê se bıdın...





JI NAV FOLKLORA GELÊ ME

S
T
R
A
N
E
K
E

G
E
L

ESMER

Esmer heyran xaniyê mala bavê
Esmera hê, hê, hê. hê, hê min jî gund tek e,
Geli gundi ciranan Esmera min yeka bejin zirav e,
Çav bî kîl e, bîsk bî têl e, çapîl dirêj e, porkej e,
nav qendil e hê, hê, hê, hê, hê çav belek e,
Ez bî qurban vê sibengê, Xwedê jî fesad û şeytanên
gundê me ra qe hîlmede reben ez im hê, hê, hê... têr qiseke
Bê Esmer hê, hê, hê, hê... Esmer hori
Keçîka taxa jorin xwezîla tû bûka mala bavê min biya yi
Jî min ra bibûya yi bermali ya mala teze, ezê bibûma malxê
Minê bigota bermaliya teze ez bî qurban hê, hê... ez bî gori.

Esmer heyran xaniyê mala bavê
Esmera hê, hê, hê, hê min jî gund der e
Geli gundi û cirano hûn dêna xwe
bîdine Esmer yeka bejin zirav e,
çav bî kîl e, bîsk bî têl e, çepîl dirêj e,
porkej e, nav qendil e, hê, hê... rengesmer e,
Geli gundi cirano dikim herim
ditina Esmera delal vê sibengê
Ne tu ci ye, ne tu war e, gundo hê, hê... ne çeper e
Ez û Esmera delal qasekê rûnêne
lî tenîştê hê, hê... car lî ber e
Her çî kesê şûşa orta herdu dîla,
her çar çavan bîşikêne, belkî
salê carek afatek hê, hê... serda were,
Geli gundi cirano hûn ê pîrsa Esmera
delal jî min dikin, Esmer yeka
Bejinzirav e, çav bî kîl e, bîsk bî têl e,
bejinzirav e xalîq rebî heywax lî min
Hê, hê, hê, hê... gerdenzer e
Esmer hê... Esmer hori
Bê keçîka taxa jorin xwezîla tu bûka mala bavê min bûyayî
Jî min ra bibûya yi bermaliya teze, ez jî te ra bibû ma malxê
Hê, hê, hê, hê... ez bî gori...

Berhevkar: SÎPAN

X A Ç E R Ê Z

ÇEPERAST

1- Dî sala 1652'an da lî dorhêla Çolamêrgê hatiye dinê. Nvîskarê Nûbar û Mem û Zîn e... 2- Notayek... Din... 3- Eşq... Endam... 4- Dijê birkîrîm... Notayek (Beropaş)... 5- Bî dîmlî "Zman"... (F) bikeve serî, bî tîrkî dibe fesadî... 6- Navê giyayek (Beropaş)... 7- Notayek... Dersdar... 8- Lî ser wî gelek tîşt tê ajotîm...

SEREJÊR

1- Navê qewmek... Dî nav malan da ye... 2- Navê helbestê ki Kemal BURKAY... Pîr bî xwoy... 3- (T) bikeve serî dibe dijê ron... 4- Navê helbestwanek Tîrk... 5- Notayek... Zmanê musîq... 6- (S) bikeve serî, lî ser wî nan tê çekîrîm... Pronavê kesin ya praniya yekemîn (Beropaş)... 7- Navê rojek (Beropaş)... 8- Reşayiya nav behra (Beropaş)... Navê partiyeke Kurdîstana Tîrkîyê ku ne eşkere ye (Beropaş)... 9- Evîna Mem... 10- Serbestî (Beropaş)... Pronavê kesin ku ya yekemîne...

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1										
2										
3										
4										
5										
6										
7										
8										

BERSIVA HEJMARA BERÊ

ÇEPERAST: 1- Cigerxwîn... 2- Adan... Ol... 3- Dest... 4- Elman... 5- Amed... Al... 6- LT... Rovi... 7- Do... Se... 8- Olperest...

SEREJÊR: 1- Camêr... Do... 2- Îd... Tol... 3- Ga... lam... 4- Endam... Se... 5- Ene... Re... 6- Dr... 7- Wota... 8- Îl... Av... 9- Xalit...

PÊKENI PÊKENI PÊKENI

ÇÊLIKA ŞÛJINÊ

Germa havînêye; lî ber rojê tiştêk lî erdê dîbirîqe. Gundi tîn ser vi tiştîkê bîrîqonek komdîbîn. Tu kesek jê dernaxe, ka ev çî ye? Bî rasti jî ev tişt derziyek e û qula wê şikiya ye. Ji gundiyan yek dibêje:

"Werin em herin xeberê bîdîn mamê maman, xwediye aqil û fahman."

Xeber digêhîje mamê maman, xwediye aqil û fahman û ew tê ser vi tiştê bîrîqonek. Radîhêjê jî erdê hîldîde. Carekê duduyan dîde ber çavê xwe û lê mêzedîke.

Gundi hemû bî hev ra, jê dîpîrsîn:

"Ka de bîbêje ev çî yê? Te em dî meraqê da kuştîn!"

Mamê maman, xwediye aqil û fahman, carekê di bala xwe dîde şênîya dorhîlê xwe û bî dengêki nerm dibêje:

"Ev çêlika şûjîne ye. Mêze bîkîn, hina çavê wê jî venêbûye."

KURD JI LI WIR HENE?

Dema ku jî dînyayê hun nû insan gîhiştîye ser hîvê, pîr kesan bî vê bûyerê bawer nekîrîn û bî kesên dîn ra dest bî danûstadinê kîrîn.

Hinekan jî wan dîgot:

"Ev rast e ku insan dîkare here ser hîvê û dibe ku lî wê derê jîyan jî hebe".

Yên dîn jî dîgotîn: "Na welleh, nabe mîrov çava dîkare here ser hîvê? Ew kesên ku dîxwazîn herin ser hîvê, ew dest davêjîn karê Xwedê, jî ber ku Xwedê ev erd, ezman û hun tiştên dîn afirandî ye."

"Hinek xortên Kurd jî dîxwastîn danûstandin hin geş bibe, dîgotîn:

"Ma we jî radyoyê nebîhist ku lî ser hîvê çîya jî hene?"

Kalemêreki Kurd jî, yê ku guhdariya wana dîke û navê çîyan dibîhîze, bî careke ve dîpîrse:

"Ma gelo lî wê derê Kurd jî hene?"

Jı xwendevanan

Hevalên delal;

Pışti seredanamın ji bo hatına ku şeva û me beşdari kir, di pişgiriyan şevên ku ji bo kovara DENG hatibûn amadekirin. Her di wê demê da pêwendiyê me bi kovara Govend re ji çê bû. Kovara Govend kovareki, bi baweriya min, li ser kultur û çanda Kurdi, bi reneki pîr zelal û ji dil dixêbite.

Ji ber vê çendê, dûmahika karê min li Kurdistanê dixwazim van bir û baweriya xwe bibêjim. (...) Amadekarên Govendê û xwendevanên Govenda delal hêviya min eve ku di warê kevnetariya gelê min da pêngavê meztir bavêjin. (...)

Pîr spasî dikim ew hevalan ra ku, ez bi gelê min ra bi cardin ji dane naskirin. Pışti çarde sala soz didim Govendê ku, em wê ji bir nakin, her wiha pêngavê we pîroz dikim...

18.2.1992
Seld GEBARI

Pışti heftê salî sîlav li we;

Rêhevalno, berî her tiştê gelek sîlavê şoreşgerî li we dikim û we pîroz dikim.

Her wiha piştigiriya we hemû sazûman-karê kovara Govendê dikim. Ez hevidarim kovara "Govend" wê jî vir pêve bibe dengê çand û hunera gelê Kurd, bibe dengê zanîn û weşandina zman, çand, edebiyat û folklorê Kurda. (...)

Bê şik derketina kovara "Govend" piştî qedexeyê û windakirina bi 70 salî bi zmanê Kurdi gelek tiştê baş û pîr giranbihaye. (...)

Newroza bori li me hemû ya, bi xebatkarên kovara Govendê re pîroz be.

Govenda me ji weki Newroza me li me hemû ya pîroz be...

Bi navê Hewşanê, Rindê, Evlê û Dilovanê
Mele Dilovan/Izmir

Sayın Mükerrrem AYYILDIZ

Govend Dergisi Mesul Müdürü.

Govend derginizi gözden geçirdim. Sizleri tebrik ederim. Şahsen Kürt tasavvuf edebiyatı ile meşgul olmuştum. Zembilfiroş, Siyamend, Feqiyê Teyra gibi masallarımızı daha önce Eyvan dergisine yazmıştım, yayınlanmıştı. (...)

Govend derginize bir övgü niteliğinde olan şiirimi gönderiyorum. (...)

Selam ve sevgilerimle...

18.2.1992

Mehmet EKMEN

Emekli Nüfus Başmuru

SILVAN

NOT: Govende övgü Kürtçe şiirinizi sayfalarımızda yayınlıyoruz.

Teşekkürler...

Jİ KOVARA GOVENDÊ RE;

Derketina kovarek wêje, çande, musîq û hunerî bi zmanê Kurdi, pîr girînge.

Ji ber vê xebat, zehmet û dilxwaziya we ez we pîroz dikim. (...)

Hevalên hêja;

Ji bir nekî! Hûn li ser navê çanda gelekî di weşînê. Ku nivîskarekî Tirk, çanda Kurdi bi zmanê xwe bi weşîna û belaw bike, ez bi vê kîrîna wî spas û hurmet jêra dikim.

Camêrek, rêzek, komêk û civatêk Kurd rabe, li ser navê Kurda bi zmanekî din binivîsîne û bêje "gelê Kurd, ev xebatê min çanda te ye", lazîme ew kes parîkî bi xwe ve bipûnîje...

Pêşnerîna min eve: Hûn di kovara xwe de, çande, dirok, wêje, folklor, helbest, musîq, efrandinên nû û hunerên Kurda bi zmanê Kurdi bîkar binin.

Bi xebatê we de serketina we dixwazim.

8.2.1992

H. BİRİNİ

J1 xwendevanan

Geli hevalên hêja,

Kar û barên ku hûn pê rabûne, bi rasti ji bo me Kurdan gelek pêwîst û cîyê serbilindiyê ye. Bi dilek xerîbî we pîroz dikim.

Bi sedan sal e çand, edebiyat û hûnerê me hatiye inkar kirinê. Çi hatiye neyarên me xwedi lê derketine, ci hatiye şewitandine, hin caran ji wêran kirine. Nimûnên van kirinan mirov dikare li pey hevdu rêzbike. Lê ez dixwazim tenê yekî bîdim: Mîqamên mûzîka me hildane, bi gotinên Tirkî va strane. Nuha ji hin kes derdikevin, ewana niv Tirkî, niv Kurdî dixwinin. Hin kes ji pêşta dîçin; bi temami Kurdî distirên. Lê tu caran ji nabêjin, an ji nanvisin ku wi kîlamê filan helbestvanê Kurd nîvîsiye û filan kes ji wi helbestî kirîye stran, ez ji hova distirêm. Mîrov ku nezanibe ew kîlam berê va tê stranê, wê qey bêje ew necamêr evî hunera hanê pêktine.

Geli xebatkarê kovara GOVEND'ê divê berê pêşin em xwedi zargotina xwe bibin. Divê ewana di nav gelê me da bîn komkirinê. Ji wunda bûyinê bîn xilas kirinê. Kovara we dikare di vi wari da bibe meydana çand û hunermendiya me Kurdan. Şanse we ji gelek e ji ber ku hûn di nav gel da dijîn, wek me ji welat dûr nin in. Çavkani li ba we ye. Wek pêlên Feratê, fena berfa Çiyayê Agri pîr û reng sipî, zêl e, mina deşta Harran û Mûşê bi bereket e. Bes em xwedi lê derkevin, ewana bi camêrî û bê kêmasî binine meydana hûner û çanda cihanê, raxine ber çavan. Wê wi çaxî carek din bê ditinê ku di vi wari da ji gelê Kurd çawa pêşta ye. Xwedi dewlemendiyek çawa ne.

Li vira pêwîst e, ez çend rexne an ji pêşniyaran bikim. Hûn çî dihesibin êdî hûn dîzanin. Bê şik pîrsa pêşin pîrsa zman e. Divê zmanê kovarê pîrani Kurdî be. Dibe ku hin mesele û mesaj hen in ku yekcar hemû kes baş têbîghîje, bi gotinek din ji bona gelemperiyê bibe, wi çaxî mirov dikare gel Kurdî Tirkîya wê nîvîsarê ji brweşîne. Tîşteke din ji, iro li parçên din ên Kurdîstanê û Avrûpayê ji kovarên edebî, çandî û hûnerî tîn weşandinê. Hûn bi wan ra ji peyvendi daynin, ji wana îstifade bikin, bi gor min wê baş bibe. Bi gotinek din dan û sitandin navbera kovaran û nîvîskaran heke hebe, kêmasî hin hundik dîbin, aliyê din kovar ji bi naverok hin dewlemend dîbin.

Ji destê min çî bê ez tu caran ji we teqîsir nakim. Di karê we yê bi qedir da her serketin û dîlxweşîya we daxwaz dikim.

E. Şameyê Kekê/Elmanya

J1 Redaksiyona Kovara GOVEND ra

Hevalên hêja;

Kovara we ya GOVEND, hejmara yekemîn gihîşte destê min. Min kovarê ji destpêkê hetani dawiyê xwend û gelek pê kêfxweş bûm. Lewra di demeke waha da derxistina kovarake çandî û hunerî gelek giring e. Hela li bajarê Amêdê, derxistina kovarek waha, tîşteke sivîk nin e, netîrsin û canfidayî ye. Di warê çandî û hunerîya gelê me da xîzmetekî bi rûmet û qedirbînd e. Di rojê iroyin da her mirovên canfîda milê xwe didin ber tîşên waha û astengîyan li ber rêyên çapgeriyê fireh dikin. Ez, we hevalên dîlsoz û culet bi dil û can pîroz dikim. Bi gorê îmkân û hunerên xwe ezê piştgiirtî bîdim kovara we.

Hevalê hêja,

Bi gorê dituna min hinek kêmasiyên kovara we hen in. Hûn wusa bîzanbin, ku biranin û rexnekirina kêmasiyên tîşteke xirab nin e. Lewra rexnenê duruşt ji dostan tîn. Ger ku dost mirov bi kêmasiyên nedîn hesandin, ew tîşteke xirab e. Ez ji ji we ra dostekî waha me û bi navê durîstiyê kêmasiyên we dibêjin û we rexne dikim.

1. Ew kovar divê ji bo demekî kurt neyê derxistin. Em dixwazin ku di warê çandî, hunerîyê da baş bîdîl e.

2. Kovara wê, tenê bi zimanê kurdî were nîvîsandin êdî baş dibe, êdî giranbîha dibe.

3. Di vegevandina helbestan da gelek kêmasî hen in. Hinek rêz bi gorê naverokên wan nehatine vegevandin.

Ez cardin we pîroz dikim û silavên germî ji we ra dîşînim. Ez bawerim ku rojên pêşîya me, we bi şahî û dîlxweşî derbaz bîbin.

B. ZINAR

Dr. Vet. Nuri DERSİMİ

**KÜRDİSTAN TARİHİNDE
DERSİM**

DILAN YAYINLARI

ÇIKTI! KİTAPÇILARDA!...

D. İZOLİ

**FERHENG
Kurdi - Tırki
Tırki - Kurdi**

WEŞANÊN DENG

ÇIKTI! KİTAPÇILARDA!...

F. WELAT

**DİYARBAKIR
SORGU VE 5 NOLU**

DILAN YAYINLARI

ÇIKTI! KİTAPÇILARDA!...

CİGERXWİN

**SEWRA AZADİ
DİWANA YEKAN**

WEŞANÊN DENG

ÇIKTI! KİTAPÇILARDA!...